

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÈN KURDÎSTANÊ LI SWËD



КРИМ МІХОР

1981г.

**BERBANG**

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet- Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris Layout och sättning : Cotkar och Gundi.

**ADRESS**

Kurdiska Riksförbundet Rissneled ed 55, NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.  
/ år övriga 100 kr/ år  
Postgiro: 643880-8

**BERPIRSİYAR :**

**A. TİGRİS**

**REDAKSİYON:**

**BAVĒ NAZĒ**  
**S. QERECDAX**  
**C. ŞERO**  
**MUĒYİD TEYİB**  
**BRİNDAR**  
**ADIL DURAN**

**PERGALARÜPELAN:**

**COTKAR Ü GUNDI**

**BERBANG**

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona  
Komelên Kurdistanê li Swêdê  
Biha: 5 kroné swêdê  
Abone: sal 50 kron

**NAVNIŞAN**

Berbang, Rissneleden 55 NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden  
Postgiro: 64 38 80-8

# **NAVEROK**

1 - " CARNA PENÛS JI ŞÜR TÜJTIR E ! "	.....3
	A. Tigrîs
2 - CIVINA BIRANINA 40 ROJIYA PROF. QANATÊ KURDO '4	
3 - ÇEND MESAJEN SERXWEŞİYÊ	.....5
4 - JI BOYAXÇİTYÊ HETA PROFESORİYE	.....6-7-8 - 9
	Henifît Celepîf
5 - ÇUN MAMOSTA KURDO M NASI?	.....10-11-12-13
	Dr. Cemşîd Heyderî
6 - QANATÎ KURDO LE ÇEND LAPEREYEKİ MÊJU DA	.....14-15-16-17
	Dr. Kemal Ali
7 -- SERXWEŞIYA MALBATA Wİ U KURDNASAN	...18-19-20-23
8 - FERHENGOKA BERBANGE	.....22

# "PÊNÛS JI ŞÛR TÛJTIR E,,

A. TİGRİS

Îro şer û tekoşîna neteweyê kurd, ji bo destxistina mafen netewî û çînî ye. ji ber vê yekê ji şer û tekoşîna me, dijwar û du ali ye. Neteweyê kurd, di her warî de şer û tekoşîneke bi heq û bêwestan dide.

Bêguman kar û xebatê ronakbirî ji, di nav vî şer û tekoşînê de ye. Kar û barêñ zanistî û ronakbirî, ji şerê pratîk û çekdarî re, rê ronahî dike. Jê re aîkarî dike û vî şer û tekoşînê pêşve dibe, digihîne serbilindiyê û serfiraziyê. Di vê babetê de bi hezar salan berî, pêşiyên ( bay û kâlén) me wiha gotine:

"Carna pênûs ji şûr tûjtir e."

Ev peyva ha, îroj ji giringî û rojanîya xwe winde ne kiriye. Ji bo rojêñ îro ji derbas dibe. Bi nezanî serketin û serfirazi nîn e. Niha bêtir divayiya zanîn û zanistiyê divê.

Gelê me, di van salêñ dawi de li her çar perçeyên welat, li dij hêzêñ kolonîyalîst û nîjadperest, di şer û tekoşîna xwe ya siyasi û eskerî de gelek pêşmîrge û tekoşerên xwe yêñ mîrxas winda kir. Hejmara şehdan naye hejmardin. Herwiha li derê welat, li biyanîstanê ji, me gelek kesen şoresser û ronakbirêñ xwe ji winda kir. Di demeke pir kin de, di nav salek-du salan de li derê welat, li biyanîstanê Yılmaz Guney, Seydayê Cigerxwîn, gelek kesen din û di dawi de ji Prof. Qanatê Kurdo ji nav me koç-bar kirin.... Koç kirina van kesen ronakbirî û tekoşer, me gelek xemgîn û dilkeser hişt. Mirina van kesen hêja, di civaka kurd de kul û brînêñ nû û kûr vekir. Di civaka me de di warê, zanistî, edebî û pêş de valabûniyeke mezin çêbû... Tê kirina vê valabûnê gelek zor e. Dê bi salan bigre.....

Prof. Qanatê Kurdo, bi rastî weki navê xwe bû. Ew Qanadêñ, ji qanadê kurdan bû. Prof. Qanatê Kurdo bi xebata xwe ya zanistî û bê westan, seren me û xwe bilind kir, serfiraz kir. Di dîroka tekoşîna neteweyê



kurd a ji bo serxwebûn û rizgariyê nan û xweya Prof. Qanatê Kurdo gelek e. Bi taybetî, wî di warê lêkolîna dîrokî û zimanê kurdî de gelek xebat kir.. Herwisa di warê nasandin û propagandayê de ji ew roleke gelek mezin û aktif list. Prof. Qanatê Kurdo, mînak û sembola konunisten kurd bû. Ew çiqas komunîst û hewqas ji welatparêz û kurdperwer bû ji. Qanatê Kurdo, divê ji me re bibe sembola komunîstî û welatpareziyê. Ew, her çiqas bi salan ji welat dûr keti bû ji, lê her tim dilê wî ji bo welatê wî lêdixist. Hiş û mî-jûyê wî ji bo netewe û welatê wî di-xebitiya. Pênûsa xwe her tim ji bo welat û gelê xwe tûj dikirin û bi kar daniya. Wi xwe bi salan ji bo kurd û Kurdistanê da xebateke hêja, giran û bêwestan. Xebat û berhemêñ (efrandinêñ) wî, ji vê yekê re mînakêñ berçav in. Prof. Qanatê Kurdo, bi bîrûbawî û bi xebata xwe, ji komunîst û welatparêzên kurd re di warê ronakbiriyê û zanistiyê de rîç û mînakeke heri hêja û giranbiha hişt. Ez naxwazin di vê nîvisara xwe de dûr û dirêj li ser jînenîgarî, xebat û efrandinêñ Prof. Qanatê Kurdo rawestim.

Ez dixwazim nîvisara xwe bi çend hevokêñ Qanatê Kurdo biqedînim ku ew çiqas welatparêz û welatevin bû. Prof. Qanatê Kurdo di pêşgotina pirtûka xwe de wiha dinivîsan-din:

"Çeka hevalbendî, pevgirêdana endamên civakê, çeka netewan bi hevra, çeka hevfamkirina wan bi hevra ziman e. Ziman neynika diyanet, feraset, rewş bîrûbaweriya mîlete, neynika ruh, can û tarîha mîlete. Ziman wusa ji çeka pêşkevtina merivêñ mîlete û civakê ye. Reng û rewşa jiyan û efrandinâ her mîletî, her endamên civakê di ziman de tê ber çavan, ziman kaniya tarîh û kultura mîlete; sebebê vê yekê her mîlet, endamên her civakê zimanê xwe hîn dîbe, dixwaze bizanibe qanûnêñ sazmanî û çêkirina zimanê dayka xwe....." (Zimanê Kûrdî, Rêzimana Qnatê Kurdo, Çapxana Kom-kar rû 5)

Prof. Qanatê Kurdo, bi xebat, efrandin û bi pratîka xwe, ji me re bû mînak û sembola zanistî, serbilindî û serfiraziyê. Ew, ne mir e. Ew bi xwe di dîroka Kurdistanê de hat veşartin. Netewê kurd wî ji bîr nake!

# CIVİNA BİRANINA 40 ROJIYA

## PROF. QANATÊ KURDO

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, di roja 15. 12. 1985 an de bi navê "Civîna Bîranîna 40 Rojiya Prof. Qanatê Kurdo" civînek pêk anî. Ji derê Stockholmê, ji bajarê din jî gelek kurd besdarê vê civîna ha bûn. Endamê redaksiyona Berbangê helbestvanê kurd Muéyid Teyib li ser navê Federasyonê axafineke kurt kir, helbestên xwe xwend û civînê idare kir.

Salona civînê, hemû bi fotografen Qanatê Kurdo, bi flaman û bi nivîsan hati bûn xemlandin. Li dîwarê pêsi fotografa prof. Qanatê Kurdo ya ku ji aliyê mamoste ve hati bû mezinkirin hatî bû dalkandin. Wek ku di fogografê de ji xuya ye di bin fotografa prof. Qanatê Kurdo de bi seran serê diwar li ser qumaşê sor. "Prof. Qanatê Kurdo di dilê me da ye" nivisarek hebû. Li bin wê li sahnê bi qumaşen sor masek hati bû tevdilkirin. Û di ser qumaş disa bi tipên gir "Civîna bîranîna 40 rojiya prof. Qanatê Kurdo" hati bû nivisandin. Sahne bi baqen gulân rengin bibû.

Fotografen Qanatê Kurdo yên wî yên dema xebatê û kurd zanayên Sovyetê hemû li ser kartonan hati bûn zelqandin û li dîwarê salonê hati bûn dalqandin.

Ji 300 kesî bêtir di civîna bîranîna prof. Qanatê Kurdo de besdar bûn. Li gor programa civînê civîn, deqîqekî li piya, di giramiya prof. Qanatê Kurdo, şehîdîn Kurdistanê û cihanê de vebû. Li ser navê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê axafineke kurt hat kîrin. Hanîfi Celepli li ser jînenîgariya prof. Qanatê Kurdo peyiî. H. Celepli piştî axafina xwe qasî 10 deqîqan ji kasetê dengê prof. Qanatê Kurdo, bi besdaran da guhdarî kîrin. Di rojêni dawî de, çaxa ku prof. Qanatê Kurdo, di nexweşxanê de razabû, rojnamevanekî kurd bi wî re hevpeyvînek çêkiri bû. Û wê hevpeyvinê girti bû kasetê. Ew dengê prof. Qanatê Kurdo dawî bû. Qanatê nemir di hevpeyvîna kasetê de qala jiyan û xebata xwe dikir û di dawiya axafina xwe de wiha digot:



### "DÊ KURDISTANEKE SERBIXWE Û SOSYALIST ÇÊBE"


"Niha li Ewrupayê Kurdên me, gelek xebatê hêja û giranbiha dikin. Komelan avakirine, kovar û rojnaman derdixin. Ev xebateke gelek baş û qenc e. Lê mixabin kurd belav in. Ji ber ku belav in jar dikevin. Divê kurd li Ewrupa di komelek de bibin yek. ew çax dê xurt bibin. Hin bêtir dê karibin li welatên Ewrupa dengê xwe xurt derxin û xebatê hêja û pêşketî bikin. Ez bawer im dê kurd di rojêni pêsiya me de bibin yek û Kurdistanê rizgar bikin. DÊ KURDISTANEKE SERBIXWE Û SOSYA-

LÎST ÇÊBE! Ez ji vê yekê bawer im."

Gelek partî û rêxistinê Kurdistanê û yên din ji 'Civîna Bîranîna 40 Rojiya prof. Qanatê Kurdo' re mesajen serxweşiyê şandi bûn. Di civînê de ew mesaj hatin xwendin.

Di civînê de Reşo Zîlan, li ser xebata porf. Qanatê Kurdo ya di warê ziman de axafinek kir. Dr. Cemşid Heyderî û Dr. Kemal Elî ji li ser xebat û efrandinê prof. Qanatê Kurdo peyiîm.

Civîna Bîranîna 40 Rojiya prof. Qanatê Kurdo, di kaseteke video de hat civandin. Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê vê kasetâ ha di arşîva xwe de bi cî kir.





## *cend mesajên serxwesiye*

Di civîna biranîna 40 rojiya prof. Qanatê Kurdo de gelek nûnerên partî û rëexistinê Kurdistanê û yên din besdar bûn. Ji wan partî û rëexistinê ku di civînê de besdar bûn û mesajên serxwesiye pêşkeşî serokatiya civînê kirin besek jê ev bûn:

Partiya Gelî Kurdistan liqê Ewrupa û Swêd, Yekîtiya Niştiman liqê Swêd, Partiya Komunist ya Îraqê liqê Swêd, Partiya Kurdên Pêşverû Li Suriyê Liqê Ewrupa, Partiya Pêşenga Karkerî Kurdistan Liqê Swêd, KUK, Partiya Karkerê'n Kurdistan Komîta Muweqet liqê Swêdê, Partiya Hevgirtina Gelî Kurdi li Suriyê, KUK- SE liqê Swêdê û TKSP-Roja Welat liqê Swêdê.

Ji bil van partî û rëexistinan gelek komele û rëexistinê demokratîk ji, ji civîna bûranîna 40 rojiya Prof. Qanatê Kurdo re mesajên serxwesiye şandi bûn.

# ji boyaxçitîyê heta profesoriyê

Reşxebera ku roja 31.10.1985a  
gihişte me, em bê zar û ziman  
hiştin. Dengê zîz, ku ji aliyê  
dinê telefonê dihat, digot; Ma-  
moste Qanat serê xwe daniye. Bê  
goman, bawerkirin ne mumkun bû.  
Lê belê em dizanin, wekî mirov  
tê dinê, dijî û dimire. Ev yeka  
bûyereke diyalektîke. Tu qewet  
nikare li hember vê bûyerê bise  
kine. Lê çi heye, ku hin mirov  
piştî ku dimirin jî dijîn. Ji  
ber ku xebat û ramanên wî mirov  
vî têşîrek di jiyana mirovatiyê  
de kiriye. Ew mirov bi xebat û  
ramanên xweve teví pêşdeçûna ji  
yanê bûye. Lewra jî mirovên ûsa  
nemirin. Çimkî şopa xebat û ra-  
manên wan di jiyanêde dimînin û  
rê nîşanî neslên hêtê didin.

Prof. Qanatê Kurdo yek ji wan  
mirovane, ku bi xebat û ramanên  
xweve di jiyana gelê kurdê bin-  
destde roleke mezin lîstiye. Ewî  
di warê ziman, edebyat, tarîx û  
folklorâ kurdîde gelek xizmetên  
mezin kirine, xebatên giranbiha  
afirandine û ji bîstî bêtir jî  
kadir di vî warîde amede kirine.

Bawer nakim, ku mirovên bi pir  
sa kurdî mijûl dibin, nav û den  
gê Prof. Qanatê Kurdo nebihîsti  
bin an jî ji xebatên wî fêde nê  
ditîbin. Lê bawer dikim ku kêm  
mirov Prof. Qanatê Kurdo dîtine  
ew naskirine û jiyana wî diza-  
nin. Lewra dixwazim di vê kurte  
nivîsarêde, qasî ku ez dizanim  
çend gîfî û gotinan derbarê ji-  
yana Mamosteyê Mezin bêjim.

Qanatê Kurdo di sala 1909'ade  
li gundê Sûsizê-bajarê Qersê-ji  
diya xwe bûye. Zaroktiya Qenat,  
di feqîrtiyê û belengaziyêde di  
bore. Gava şerê cihanê yekem jî  
destpê dike, jiyana hîn jî giran  
dibe. Şewat û talana şer nahêle  
mirov di mala xwede bi malbata  
xweve rûne. Her ûsa di wê demê  
de, nîjadperestêñ tirk dest bi



getlîama ermeniya kirine. Teví  
ermeniya kurdên êzdî jî - Qanat  
ji kurdên êzdî bû - têne qir ki  
rin. Malbata Qanatê biçûk teví  
cîranê xweyî ermenî di sala  
1918'ade direvin, diçin Erménîs-  
tanê û li gundê Korbilaxê cîwar  
dibin. (Niha ji wê gundêre dibê  
jin, Şenkanî - li nehiya Aragasê)

Pir naçe, piştî çend sala mal-  
bata Qanat dîsa bar dike, vê ca-  
rê berê xwe didin Tîblîsê, paýtex  
tê Gurcistanê û li wê derê bi cî  
dibin. Ji bo ku alîkariya dê û  
bavê xwe bike, Qanat dest bi kar  
dike. Ew serê sibê kodika xwe  
hiltîne milê xwe, diçe nav sûkê  
û heta êvarê ji bo çend kapêka  
bide hev sola boyax dike.

Li Tîblîsê bavê Qanat dimire û  
diya wî jî mîr dike. Qanat jî di  
çe cem pismamê xwe Reşîdê Osman  
dimîne.

Di wan salande, sala 1921'ê, er-  
menîkî bi navê Hakob Gazaryan -  
kurda jêre digotin Apo - mekte-

bek vekiribû, Mekteba Apo. Apo, bi gotina Mamoste Qanat, kurdî baş zanibû. Ewî xortên kurda hînî xwendinê dikir. Hîmê xwendîna kurdî li Sovyetistanê bi vê awayî hatibû danîn. Di Mekteba Apode, ji bo hînbûna kurdî tîpêr er menî bi kar dihat. Qanatê ciwan jî di Mekteba Apode dest bi xwen dinê dike. Ew him dixwîne him jî sola boyax dike, ji bo ku xwe xwedî bike.



Di sala 1928'ade Qanat Mekteba Apo xelas dike. Wê çaxê Partiya Komûnist li Tıblîsê bi kurdanre civînekê çêdike. Qanat jî di wê civînêde besdar dibe. Berpirsyarênen partiya komûnist, politîka partiyê derbarê maffîn miletên bi çûk diyar dikan. Her ûsa jî dixwazin wekî kurd zarokêna xwe bişînin xwendinê. Di wê civînêde Qanat radibe piya û dibêje, wekî wî xwendîna ewil xelas kiriye û dixwaze pêşekî (meslek) hîn bibe an jî xwendîna bilind bixwîne. Ber-

pirsyarênen Partiya Komûnist bi vê yekê gelekî kêfxwes dîbin û gazî Qanat dikan. Di nav berpirsyarênen Partiya Komûnist rehmetiyê Erebê Şemo jî heye. Ereb û Qanat nasî didin hev û soz didin Qanat wekî wî bişînin Lênîngradê ser xwendînê. Qanat li wir diyar dike wekî hevalêñ wî jî hene ku dixwazin bixwînin. Wê çaxê berpirsyarênen Partiyê navnîşana Qanat jê distînin û dibêjin: tu here hevalêñ xwe kom bike, emê ji tere namekê bişînin. Wê çaxê hevalêñ xweve werin, em we bişînin Lênîngradê.

Piştî demeke kurt Qanat ji Ere bê Şemo namekê digre. Ereb di na ma xwede nivîsiye: tu û hevalêñ xwe werin Rewanê, emê we bişînin Lênîngradê ser xwendinê. Qanat bi vê yekê gelekî kêfxwes dibe û diçe hevalêñ xwe; Ardaşê İbo, Müradov Tîtal, Nadirov Iso, Salihê Cewar, Hesenê Şemo, Edoyê Cengo û Mirzoyê Emer dicivîne û riya Rewanê digrin. Partiya Komûnist, ew heyşt xortên kurda dişîne Lênîngradê ji bo ku di Fakûlta Palade bixwînin.

Her heyşt xortên kurda jî di wextê xwede xwendîna xwe xelas dikan. Çar ji wan vedigerin Ermenîstanê û di nav kurdande mamos-tetî û karê cîvakî dikan. Qanat û hevalêñ wî, Edoyê Cengo, Salihê Cewar û Mirzoyê Emer li Lênîngradê dimînin û di Unîvîrsîtêta Lênîngradêde dest bi Înstîtûtarîx, filosofî, ziman û edebyatê dikan.

Piştî qedandina Înstîtûtê hevalen Qanat ên mayîn jî vedigerin Ermenîstanê, Qanat tenê li Lênîngradê dimîne.

Him di xwendîna Fakûlta Palade him jî di xwendîna Înstîtûtêde Qanat gelekî pêşde çûye û derecên baş girtine, dersdarê wî, wekî H.A. Orbîlî, N. Ya. Mar ji wî gelekî hizdikirin. Ew pêşniyarê idara Unîvîrsîtê dikan, wekî Qana di Înstîtûtêde bimîne û bibe uldar. Qanat li ser biryara idara Unîvîrsîtê li wir dimîne û li cem Aleksander Ardovîç Freyman, di sala 1936'de dibe Aspirant. (1) Sala 1941'ê Qanatê Kurdo aspîrantoriya xwe xelas dike û dibe doktor. Qanat doktora xwe li ser lê



kerên di zimanê kurdîde nivîsiye. Şerê cihanê diwem destpêkiriye. Lênîngrad ji alî leşkerên faşist de ketiye bin muhasarê. Rojê 4 - 5 hezar mirov ji birçibûnê û nex weşiyê dimrin. Hukumatê Sovyêt nahêle, ku mirovên ulmdar tevî şer bibin. Qanat dixwaze tevî şer bibe. Ew diçe cem hukumatê, wekî destûr bidine wî ku tevî şer bi-be. Ji ber ku Qanat dibîne ku mîrin nêzîk bûye. Çêtire ku mirov bi mîranî di cephêde bimire, ne ji birçibûn û nexweşiyê. Her çi-qas hukumat nahêle jî Qanat ji ya xwe namîne û dawî dax waza wî qebûl dibe. wekî ew tevî şer bibe. Hema Qanat rîkî dibîne û jina xwe dişîne cikî emîn û te-vî Ordiya Sor dibe û dijî faşis-tên almana dest bi şer dike.

Şer bi serefraziya Ordiya Sor xelas dibe. Lê li Sovyetistana Sosyalîst bêtirê bîst mîlyon insan dimrin. Gelek gund û bajar

wêran dibe, ji ortê radibe. Kes nizane, wekî kî miriye yan kî sax maye. Rojekî Qanat di rojnamekêde dixwîne, ku Meclîsa Sovyetî xe-lat dane çend ulmdarê rojhilat-nas. Navê A.A. Freyman, mamosteyê Qanatê Kurdo jî di nav wan na vanadeye. Qanat şâ dibe û namekê ji mamosteyê xwere dişîne û wî pîroz dike wekî ew xweşe û nemîriye. A. A. Freyman jî bi lez ca-ba nama Qanat dide û wî gazî Lênîngradê dike, wekî were dest bi karê xwe bike.

Qanat diçe Înstîtûtê û dest bi karê xwe dike. Ew li wir dersê zimanê kurdî dide. Havînan jî diçe Ermenîstanê û li wir dersê zi-man û edebyeta kurdî dide mamos-teyên kurd.

Sala 1953'a Qanatê Kurdo dest ji dersdayînê berdide û destpêdi ke xebatêñ xweyî ulmî dinivîse.

Sala 1959'a H.A. Orbîlî li Lê-nîngradê di Înstîtûta Rojhilatna

sîde para kurdzanînê vedike û bî xwe jî serokatiyê dike. Teşkîlbû na para kurdzanînê, bêgoman bûye reke tarîxî bû. Bi vî awayî rê vebû wekî ziman, edebyat, kultûr û tarîxa kurda pêşde here. Zanayê Mezin, Hovsêp Abyaroviç Orbêlî di sala 1961'êde serê xwe dânnî. Cihê wî zanayî Qanatê Kurdo girt. Di Înstîtûta Rojhilatnasîde bû serokê para kurdzanînê.

Di sala 1968'a de Qanatê Kurdo bû doktorê ulmên fîlologiyê. Heta serê xwe deyne, Qanatê Kurdo ma wekî serokê para kurdzanînê. Ewî li gel gelek xebatê zanistiye hêja, ji bistî bêtir ulmdar jî hazir kirine: Marûf Kaznedar, İbrahim Azîz, Kawûs Qeftan, Abdulrehman Marûf, Kurdistan Mukriyanî, Cimşîd Heyderî, Zera Üsîv, Kerîm Eyûbî, Ordîxanê Celîl, Çerkez Bakaev, Mamed Nazerov, I.A.

Smîrnova, J.S. Mûsaelyan, M. B. Rûdenko û ên mayîn. Her şagirtekkî Mamoste Qanat jî gelek xebatê hêja afirandine.

Eve jiyanâ Mamosteyê Mezin bi kurtî. Ji boyaxçitiya solanta bi profêsiyê; ulmdarê kurdê pêşin li Lênîngradê.

Piştî Şoreşa Oktobrê, gelek za rokêñ kurda mecal dîtin ku bixwînin. İro li Sovyetistanê gelek zanayêñ kurd hene. Ji bo pêşdeşûna ziman, edebyat, çand, folklor û tarîxa kurdî xebatêñ kurdêñ Sovyetistanê pir bi qiyetin. Ew

xebatêñ giranbiha, tenê li Sovye tistanê namînin, ew her ûsa dighêñ Kurdistanê jî. Mamoste Qanat bi vê rengê li Kurdistanê hate naskirin; bi saya serê xebatê xweyî hêja.

İro gelê kurd, bi lawêñ xweyî wekî Mamoste Qanat serbilinde. La wêñ ûsa nemirin, wê her û her di nav gelê xwede bijîn.

Mamosteyê Mezin, bi xebatê xweyî hêjave her ûsa jî tevî pêş deçûna civata Sovyetistana Sosya lîst bûye, civata ku ew xwedî ki riye, kiriye ulmdar. Mamoste Qanat komûnist bû, ew di organa Partiya Komûnist a li Înstîtûte de berpirsyar bû. Hukumatê Sovyet, çardeh xelat(medalyon) dane Qanatê Kurdo, ji bo xebatê wiyî giranbiha.

Nav û dengê Mamosteyê Mezin, min ji mîjve bihîstibû. Li sala 1982'a bextê min lêxist, min ev Mirovê Mezin dît jî, gava ez bi Seydayê Cigerxînve çûne Lênîngradê. Piştî hevdîtina me yekem ez hersal diçûm Lênîngradê, ji bo ku Mamoste Qenat ziyaret bikim. Mirov ji sohbetê wî têr nedibû. Ev gotinêñ Mamosteyê Mezin qet ji guhê min dernakevin: Ez naxwa zim bimrim. Eger ez kar nekim, wê çaxê ezê bimrim. Ji bo ku ez nemrim ez dixebitim.

Hanefi Celepli



# çûn mamosta kurdo m nasî?

DR. CEMŞİD HEYDERİ



Ji destê çepê; Qanatê Kurdo, Cigerxwîn û Cemşid Heyderî

Diway roxanî komarî demokrati kurdistan, bo yekem car bîstibim ke kurde Barzaniyekan royan kirdûte yekêyi Sovyet, ewsa herwa m dezanî kurd her le Sovyet najit.Tenha kurde penahendakanî Eraqbe naçarî xoyan kirde bawesi walatî Sovyet Belam ke nextek gewre bûm, destim kird be xwêndinewey kitêb û kovar, bere bere asoy têgeyîstinim tirewantir bû, le nawerastî pencakan çen kitêbêkî mêtjunûst be navbang mamosta Emîn Zekî Begim kewte dest, le wane mêtjûy Silêmanî û xuladey tarîxî kurd û kurdistan.Bo yekem car zanim nek tenha Barzaniyekan le Sovyet de jîn, belku kurdî tirîş hen le xeketî Sovyet, ewanîş maşî xoyan heye wek hemû millete azadîxwzekanî ew wilate.

Le salî 1957 le Mosko vîstîvalî lawan û qutabiyankira, ber le vîstîval le şarî Hewlîr cîm û colêkî zor hebû bo besdarî kirdinî nweneranî lawanî kardî, le rîz lawanî cîhan.Diwa bo diway vîstîval be maweyêk, rojêkyan çend mêtwanêk hatine lay kakim, wa derkewt lew xwêndkare kurdane bûn ke besdarî vîstîvalyan kirdi bû. Çunke dway royoştinyañ kakim darcigare, filce û taxmî te-

raşî nîşandayn û gotîrewane hînî Mistefa Barzanîn, ew lawane besdariyan kirdibû le vîstîvalî Masko û çawayan be Barzanî kewtî bû û ew diyaryaney legel xo bo hêna. Kakim deng û basî Mosko û wezî kurdekanîbo geraynewe, nawî çend kesêkî lêhatûy kurdî Sovyetî hêna, le wane Semedê Siyamendo qaremanî Sovyet, Eminê Erdal, Nadoyê Xido û Qenatê Kurdo, ewsa bo yekem car nawî Qenatî Kurdo m bist. Sal wersûra, Şariş 14 gelawêj royda, rîga kirayewe le nêwan komarî Eraq û Sovyet, le kovar û rojnamekanî kurdî başî kurdî Sovyet û pêşkewtinî edeb û jiyanyan denûsra.

Xekêk le waney rojî gewreyan binî bo penasins berhemî kurdî Sovyet, mamosta Mihemed Totiq wirdî bû. Wirdî Xame rengineyek xiste kar bo bilawkirdinewey folklor û berhemî kurdî Sovyet û gorînî witarekanî Riya Taze' le pîti kirêlîk bo Erebî. Ta ew kateş be tewawî Zorbey Zorî kurdî Eraq, zor kemyan derbarey kurdî Sovyet dezanî. Le salanî 1959, 1960

sekêti Sovyet besdarf le pêşangay Bexda kird, le sêkşanî Sovyetida, besî kitêb hebû le naw deha zimanî mîlletanî Sovyet-i-zimanî kurdîş-hebû, dête yadim nûsnêkî nûserî benawbang Erebî Şemo m we dest kewt. Le heman katda lew saled da nameyekî Qenatî Kurdo le kovarî Hawî – da bilawkirayewe. Ew nameye yekem lapereye le nûsinekanî Kurdo ke min xwêndbimewe. Ev kate ne dehat xeyalim ke rojêk bêt nek tenha min le dûrewe nûsinekanî Qenat bixwên mewe belku yektrîş binasin. Le salî 1968 le Mosko bûm, rojêkyan çend biraderêk pêyan gotim ba biçine amajgay rojhelatnasi, imro kurdayîf difa deka, pîsim Qenatî Kurdo ? belê.. belê Qenat. Ber le wey bigeme amojga le xeyalî xom da wêney Qenatîm kêşa bû, mirovêkî be sala çûy û kal, çunke biraderekanim agadaryan kirdim le rîgada ke mamosta yekem witarî le ser zimanî kurdî bilawkirdewe le salî 1933, katî geyistîne amojga, komelêk le xwêndkaranî kurd û legel jîmsreyekî zor e zanayanî Sovyetî leber dem holêkî gewre rawesta bûn, carê kobûnewe destipê-nekirduwe. Xek lew biraderaney le gelma hat bû amojga minî be mamosta Qenati kurdo nasi Qenat mirovêkî nimce bilind, pûrres û lûldiraw, daw-daw spî tê kewtibû, dilxoş û roges, way nîşan deda le çili retnekirdûwe, zorî pê ne çû zerg lêdira, kobûnewe destipêkird.

Ewe yekem car bû çawim be Qenat kewt, le xomim depirş: çun ew gence be hêz û tiwanay e. 33 le mew pêş witarî le ser zimanî kurdî bilawkirditewe? ne xêr ew birederane be hele çûyne, ewsa zimanî Rosî be başî m ne dezanîta witarekanî Qenatî Kurdo bixwênmewe, ta ku le nêzîk binasim, hel rîk ne kewt carêkî tir Qenat bibînmewe, çunke mamosta geraye we Leningrad, ministriway çend mangêk geramewe wilat. Min zor şîtim le ser Qenatî Kurdo bîstibû le demû mamostayan Marîf Xeznedar û Awrehmanî Haci Marîf ke her dûkyan qatabî Kurdo bûn. Le salî 2970, bo dûwem car geramewe Sovyet bo xwendin. Ew careyan rom kird şarî Leningrad, melbendî Şorisî Oktüberî mezin, şarî Zanist û şarî yekem dezgay kurdanî le Sovyet. Le Sêptemberî ew sal bû, bo dûwem car çawem be mamosta Kurdo kewt. Hawrî û dostî xoşewîstim Dr. Awrehman minî birde amojgay rojhelatnasi Leningrad û çûyne kabiney kurdanî, mamosta Kurdo serokî besî kurdî bû, ew zatañes karîzanistian têda dekird: Margirêt Rodinko, İshaq Tokirman, Ordikanê Celil, Zarê Yosidov, Jaklinê Mosilyan, Emginyat Silîva û Awrehmanî Hari Marîf.

Qenat kewte qisekirdin, zor be pereşewe deng û basî Kurdistan lê depirsim, be taybetî duway peymanî adarî 1970 aya wezi çûn? Kurdekan deskewtiyan zore? hikomet be dilsazî hatite pêşewe, mamosta Qenat zor giringî deda be barî siyasi kurdistan û xebatî gelî kurd le pênav azadî. Her dem deygot û deygotewe kurdî Eraq xwênekî nwl yan daye colanewey azadixwazî kurd. Emey kurdî Sovyet Şanazî be xebatî şoresgêraney kurdî Eraq dekeyn, ewsa bû m derkewet mamosta ta ci radeyek kurdperwere, ta

ci radeyek agadarf heye le barî kurdistan be giştî, çûn kurdekanî Sovyet hengaw be hengaw barî kurdistan lê kdedenewe.

Le mawey 31 sal le Leningrad zor katî xaşî û be sûdim birde ser legel mamosta Kurdo, be taybet. duway ewey bûme şagirdî mamosta le besî kurdî amajgay rojhelatnasi salî 1976. Axiftin û daniştin legel Qenat zor xoşbû, çunke asoy zanyarî zor firawan bû, derbarey Qenat serî le derde-kird. Zor şarezayî hebû le ziman û edeb û mîjûy kurd. Mamosta katî xoy be firo ne deda, lew katey degeyişte besî kurdnasî, karî rojaney kurdnasî beser dekirdewe û bizansî pilanî mangane û salaney beşdaranî grûpî kurdî ta ci radeyek cê be cê kirawe, beşdarf dekird le encûmenî zanayanî amajga, le kobûnewey rîekxirawî hizbî, beidarikirdin le kar û barî komelayetî, nûsinî rîtistîr(têbinî) le ser ew kar û berhemaney pêwendiyen be ziman û wilatanî rojhelat heye. Qenat her temenî zortir debû, mandûbûnt ne dezanî, le layek berdewam bû le nûsinewey rîzmanî kurdî, ber perçdanî bîr û bawerî hele le ser ziman û diyâkîte kurdîyekan, be taybetî giringî dedaye ew nûsinaney kurd nase Ewrûpiyekan û kurdnasî. Eraq û Iran, car car ber hekitî û rexney le kurdnasanî Sovyetî degirt û witarî le seryan bilawdekkirdewe. Mamosta cige le karî zanistî taybetî xay, beşdarf dekird legel endamantîrî grûpî kurdî Leningrad û be hawbeşî witar û lê kolinewey amade dekird, ewey min agadarbim be dû qûşî legel Rodinko, Vasiliva, Yosopova, Tokirman û Mosilyan çend berhemekyan bilawkirditewe.

Mamosta Kurdo be çawî bawk seyîf xwêndkaranî kurdî dekird û amajgarf dekirdin û hanî dedan bo sûdwergitin lew hel û barey ke bûyan helkewtçwe. Zor carîş pêşniyarî dekirdin. Ci babetêk helbijhêrin bo nûsin û lê kolinewe. Carêkî boy gêramewe, ke yekem destey xwêndkaranî kurdî Eraq hatin bo Sovyet, çendêkyan hatine Leningrad, lewane Dr. Kawis Qeftan û İhsan Fuâd û Marif Xeznedar, gotî le İhsan im pîşî niyazit ciye? le ser ci denûşî le wilam da witi, le ser edebî ingilizi.. çunke besî ingilizî m tawew kirdûwe le Bexda- gotim: Bû ewey le ser edeb û zimanî ingilizî binûşî, pewistîne dekird bêy bo êre- ême demanewê kadîrî kurdnastan lê peyda bikeyn.. erkî ser şanî êwe xizmetî ziman û edebî kurd biken. Le ser edeb û zimanî ingilizî zor nûsrave û xelkî tiriş hen, emey kurd debê ew hele le kis xoman ne deyn, pêwiste le der zimanî kurdî, şir û edeb binûşîn. Mamosta Kurdo pêşniyarî İhsan kird le ser şairî qûnaxî nwey kurd. Haci Qadiri Koyî binûşî.

Mamosta Kurdo mirovêkî zor dilsatû utewazî bû, belkû amade bû legel yekêk cil sal le xoşî bicüktir bit danişlî qisey legel bikat û amojarî biket her weha dergay malî weser pişt kirdiwewe bo xwendkaranî kurdî Sovyet, Ordizanî Celîl bûy gêramewe lew katey Ordikan û Celîl biray û Meksimê Xemo hatin bo Espirantore le Leningrad, Qenat. Kurdo wek biçekî yox çawdêrî dekirdin û yarmetî dedan. Lew rojey bûme şagirdî Kurdo, ewsa zêyetir ew mirove mezine m nasi, zanim çend dilsoz û xoşbawer û dilpake. Çend cergoslawî ewe-ye ew roje bibinê ke ntewey kurd wek hemû mîle.

tanî cîhan be azadî û serbest bişt.

Mamosta amade bû hemû yarmetîyêk pêşkêşî be şagirdekanî bikat, eger bizanîya sùdpexşe û şagirdekeş ciddîye le karî xoyda, herweha çawî le karî ne depoşa, deywist şagirdekey bezanîş çekdar bikat. Mamosta kurdo zû helde çû betaybeft eger şagirdekey ewey pêy raspirawe cê be cê ne kirdbaye, belam le hemen katışda zû sard debûwe we. Lew rojey hatme beşî kurdî yekser pêywîşîm: zor im pêxoşe kadirê kî tir avmade bikem, min zor razim le waney tir, zor be balay Dr. Marîf û Dr. Awrehmanî da heldeyot cê be cê kirdin û disiplin. Daway lê kirdim pilan û programêk bo xom amadekem, bo mawey sê sal, mang be mangî dîyarbit ci dekem, ci dexwenmewe, zo denûsim. Cîge lewîş goti: debî le mawey salt' yekem hemû ew nûşnaney le ser kurd nûşrawîn le Sovyet û laleyen kurd nasanîtir û nûşanekanî min-Qenat-bixwenmewe.

Mamosta Kurdo, xoy zor mandû dekird be şagird û xwendinewey babeff ew nûşney te şagirdeke pêwe xerik de bû, Qenat her rojnams û kovarê kî kurdî weçeng kewtibaye, ta tewawi nekirdibaye wazî lê ne dehêna, bo qelmi sor baziney be dewîf ew wişê û ristane dekêsa ke rast danerêjrawe ya xod nwêye, eger le ridteyêk negeyiba pirsyarî de

kird, ege ştêkî be dil nekiye yekser rû be rû deygot kird, ege ştêkî be dil nekiye yekser rû be rû deygot Qenat le naw xelkî kurdî Sovyet da cêgây rêz û payey berz bû, roj ne bû be deha namey pê ne gehîştibaye le kurdekan, ewey daway amojgari lê dekird, ewey pirsyarî kî lê dekird derbarey ziman yan mîjû, cîge lewîy kurde awarekan û rêkxirawekanî kurdî le ewrûpa her dem pêwendîyan legelya hebûwe, bo rojnam û kûvarekanî kurdî derbewey denûşî, ray xoy derdebiñ le ser meseley kurd, xebatî mamosta be weş ne dewesta, belkû le rêgay dezga û rêkxirawekanî Sovyetewes denga kurd û daxwazyekanî be raberatî wilati Sovyet radegeyand Qenati Kurdo, beşdarî ahengî Newroz û kobûnewey xwendkaranî kurdî dekird û le ahengî da wîtarî dexwendewe, beşdarî helperkî û goranî dekird, zor car deygot ew kurdey 'stiran û şayî' nezanî be kurd najmîrât. Carêkî boy gêramewe lew katey jeneral Mustafa Barzanî le Mosko penahende bû, Qenatî bo carî yekem çawî pê dekewê û lîy depîrsî: şayî û goranî kurdî dezanî ? le wilam da Barzanî de bê jî: na, Qenatîş delî: tu ci kurdî ? cîma kurd heye şayî û goranî nezanî. Qenat zor car bas û serhatî kurdebarzaniyekanî degêraye, le demî ew kurdanewe basî raperînî 1943-1945 tomarkîrdewe, le mixabîn her beşêki kemî bilaw-kiraytewe, le safl 1974 le kovarî Rojî Kurdistan beşî yekemî bilawkiraytewe, Mustafa Barzanî cêga û rezî taybetî hebû le nêw kurdekanî Sovyet be giştî û le nêw ronakbûranî kurd be taybetî û be raberî kî efsaneyî le qelem dîrawe, dîte kewte kar zorbey ewanew carêk çawyan pê kewtibû basyan bo degêraynew, ewey deygot ew carey hate yerîvan, ewî tir le kûnedefter degera û deygot.. ewe xetî Barzanî ye, mamosta Kurdo aşayetsî le gel he bû û am û şay kirdiye, boy gêramewe le safl 1957 ke le Mosko fêstîvalî lawan û qutablyan gêra, lawe kurdekanî ke beşdîyan têda kirdî bû, çawyan be Qenat kewt û dawayan lê kird. Çawpêkew-

tinê kyan bo rêkxa legel Barzanî, belam mamosta inkari ewey kird ke Barzanî denasî û dezanî le kam şwêne.. her çende hemû rojek çawî pê de kewt û dengû basî fêstîvalî bo degêrayewe. Belam duway legel Barzanî rêkewt û çawpêkewtinêkî bo rêkxitin.

Hereshênanî şorişî Eylal mamosta kurdo sexlet kirdi bû, her deygot û deygotewe piştpestin be dijimin ewe neticeyetî, pêwîste kurd dost û dijimin binası, İmpiryalzm û xolamêt wan maffî kurd taqe rîga leber demî kurd eweye hêzî niştiman perwerî kurdû hêzî çep pê kra xebat biken le pênatî demokratiyet û azadî. Mamosta le riwangey Markîşiyetewe temaşay meseley netewayetî dekird û birway behêz hebû be maffî çarenûş kurd û servioxî kurdistan.

Mamosta Kurdo, hemû twanay xoy terxankirdî bû bo pêşkewtinî kultûrî û zimanê kurdî, hewlekî zorî deda kurdnasî le Sovyet berew pêştir birwat û hengawî baştır binêt beşî kurdî bikrêtewe le zankoy Lenîngrad û Mosko. Evey min agardarbim çend carêk be name pêşniyârî kirdwey beşî kurdî û gotinewey mîjû kurdistan le beşî wlananî. Rojhelaşî nawerast le kolîcî rojhelaş le Lenîngrad û amojgaj milletanî Asya û Efrîya le Mosko mamosta Kurdo lew dû kobûnewey kurdnasانî Sovyet ke giran le safl 1980, 1982 beşdarî kirdiwe û zor pêşniyârî praktilîk pêşkêşkirdewe derbarey berwe pêşbirdinî kurdnasî le Sovyet û çap û çapemî kurdî û radyo û perepêdanî.

Mamosta zor car basî ewey dekird, pêwîste liqê kî nwê le kurdnasî hekîrâtewê be nawî 'xanînasî' le safl 1977 ke Dr. Izeddîn Resol hat bû Sovyet bû nûşînî karê kî zanîşî derbarey rîbazî riyalistî Sosyalist le edebî kurdî, mamosta ber helistî ewey kird, kaşî be sê qolî min û mamosta kûrdo û Dr. Izeddîn daniştin, Dr. Izeddîn ray wabû, pêwîste le ser lê koşînewe berdewam bit ke pêwendî heye rebebî rîyalistî sosyalist belam kurd pêy le ser ewe dagirt ke pêwîste lesser xanî binûşî, çunke xanî barî zor lê koşînewey heldegrê le ser binûşrêt. Reyekey mamosta Kurdo karî le Dr. Izeddîn kird namey duktora ilamî le ser xanî feylesof û soffî binûşt.

Helwêstî merd û pîyawaney mamosta Kurdo way lê kirdibû hemû layêk rezî lê bigrin û hisab bo biken. Le safl 1979 le 70 saley Qenat ahengî kî gewre rêkxira le layen dost û nasya û zanayanî amojga û beşdarî jimayerkî zor le kurdekanî Sovyet û xwendkaranî kurdî derewe. Lem ahengeda, Yorî Pêetrosyan serokî amojgaj rojhelaşnasî Lenîngrad wîtarî kî zor be nirxî got û berêzewê basî xebatî zanîşî û komelayetî Qenatî Kurdo kird, her weha xwendkaranî goranî û helperkî kurdî yan pêşkêşkird, mamosta Kurdo zor keyfî be goranî û şayî dehat, duwa car pêkewe goranî lorkê û lorkê û şayîm man kird, le mangî Sêptemberî 1983 le malî Orduzanî Celsî be hoy hatînî cend biraderêk kurdistanî Surya bo Lenîngrad, Qenat zor goranî kurdî folklorî got. Evey şayanî base Qenatî temeni 70 salida bo yekem car le cilî kurdî tê da beşdarî kird, ke pêşkêşî kira bû bem bûneyewe le layen nûserî em dêrane her weha amojgaj rojhelaşnasî korê kî zanîşî rêkxit bem bûneyewe çendeha zanay kurdnas û Iranîş beşdîyan têda kird, zanayekî lawî



Ji çep ve:

Rêza 1, 1- Xalfîn 2- Çetoyîf 3- Yosipova 4- Kurdoiyîf 5- Hesretyan  
 Rêza 2, 1- Celîlî Ordîkan 2- Aşîryan 3- Karlivê Çaçanî 4- Şakirê Miho 5- Kemal Eli  
 Rêza 3, 1- Cemşîd Heyderî 2- Celîlî Celîl

İngîlîzîş besdarî têda kird, rolî Qenatyan le pêş-xistinî kurdolojî nişanda. Nûserî em wîtares be na-wî kurdnasani Eraqewe wîtarê kî xwêndeme, rolî gewrey mamosta kurdo y destnîşankird le xizmetî ziman û kultûri kurdî da û rêz û supasî kurdnasani Eraqi derbirî beramber Qenatî Kurdo, çunke zorbey kurdnasani Eraq, betaybeî le hînî edeb û ziman şagirdî Mamosta Kurdon.

Mamosta Qenatî Kurdo, pêwendî zor tundî hebû le gel kurdî derewey Sovyet hem le rîgay alogirkirdinî name û çapemenî, hem dostayetî legel rîberanî bizûtnewey kurdî û çep le kurdistan. Zor le nweñer û rîberanî kurd eger rîyan kewtibaye Sovyet, bêguman çawyan be mamosta Kurdo dekewt. Eweş eweman bo de selmînî ke Qenat mirovê kî û niştîmanperwer û kurdperwerê kî dilsoa bû. Lew sê saley le Swêdim her dem be name û telefon legel Mamosta Qenat pêwendim hebû. Le salî 1984 ke bo dû roj serim le Leningrad da, Mamosta destnûsê kî xoy damê le ser kurdnaşî wergêrme ser zimanî kurdî, minîş belênim da wergêrim, belam duway

ew çapdekrêt le Sovyet, zor be daxewe ta êsta nekirawe, belêñ bêt, bo 30 Oktoberî 86 be dest xwendewaranî bigeyê nim.

Duwa car legel Mamosta Kurdo le rojî 12/9/85 be telefon diwam, dengî be zehmet dehat û hêzî têda nema bû gotî: zor nexoşim, ew dermaney Heneft şandibûy karî nekird, destnûseke le bîr meke lenakaw dengî gora û be dilê kî xoşewe gotî'

Cemşîd, Werir korî bûwe nawî Remo m lê nave, mamosta mînalî zor xoşdewîst legelyan degeşaye-we, wa dîyar bû zor peroşî ewe bû wezîrî taqe korîjinbihêni û zaro kî bibêt. Mamosta le temenî xoy dirêjda taqe awatî hate di ewîs Wezîr korê kî bû, awatî here gewrey Mamosta ewe bû be çawi xoy bibînê alay serbexoyî kurd berz bibêtewê û kurdîş bêt, Rêzî mîllitetanî cihan, belam mîrdin derfetî neda, le rojî 30/10/1985 dile gewrekey le lêdan westa, duway 52 sal le xizmetî Kurd û Kurdistan.

Hizar silaw bo giyanî pakî Qenatî Kurday....

Kurd û Kurdpower.



# QANATİ KURDO LE ÇEND

LAPEREYEKİ

MÊJÛ DA

DR. KEMAL ELİ

Birayans azîz!

Em daniştiney îmroman bo eweye ke be çend uşeyek yađî cilrojey edib û zimanewan û mêtjnûs û folkloristî zanay nemir Qanatî Kurdo bikeynewey, be omedî eweyn ke rojanî dahatûş tîrîş yadkirdinewey em zana û kurdper-were nemire be kor û daniştinî firewantir bikrê û ême le layen xomanewe ew soze dedeyn ke naw û kare mezine-kanî mamostayî nemir herdem legel rolî kulturi û roşenbîrî kurdî da geşe û pere pê bidirê û nerxî zanistaney xoy win nekat.

Qanatî Kurdo mirovekî sade, kisexoş û berzewq bû. Zanayekî lêhato û kurdnasekî be newbangî İnstîtütî rojhilatnaş ser be korî zanîyarî Sovyet bû ke xawenî komelek le berhemî zanistye.

Kurdekfî dilsoz û xawen hestekî neteweyi resen bû. Awa-tî yekgirtinewey û azadî û serbexoyî Kurdistanî gewre bû. Taku mîrdînîş omedî bînînîf alayî rizgarî Kurdistan bo be çawî xoy, belam daxî giranim ew awatey ne hate dî.

Kare be nîrx û zanîstîyekanî mamostay nemir gewahî deden ke taku ci radeyek xoy be lê kolînewey meseley netewekeyewe mandû kirdûwe. Mamosta Kurdo ew mirove kurd perwerye ke le mêtjû kurda nîrx û cîgayekefî tay-betî heye û hergîza û hergîz namirêt.

Belê hemûy salek têper bibû be ser şînî edîbanî kurda Tofîq Wehbî, Cigerxwîn, Yılmaz Güney, Muftîzade, Alâ-dîn Secadî û Şamî Kırmaşanî da û wa em salîş edîp û zi-manzan, folklorist û mêtjûnosî kurd mamosta Qanatî Kurdo çûwe rîzî karwanî edibe nemirekanî kurd û malavayî lê-kirdîn.

Lem witare da tenha ewey peywendî be Qanatî Kurdo û hidek leyenî mêtjûy netewekeyetî be kurtî dexeyne pêş çaw, çunke dilnîyam ke jîmareyek le zimanewan û nûse-ranî kurd ke nîzdîkî bon yaxud aşnay nûsînekanî bon kem û zor denosin û le serî deduwêñ.

Ca ber lewey lew bareyewe bidwîm hîzdikem kemek serincî birayans azîz rabikêsim bo kurteyekî meseley kurd-nasî le Sovyet da û rolî mamostay nemir le perekedan û geşekirdinî da. Her le sedey 18 hemewe wilate Ewrupayıye kolonîyâstekan û Rusyay Qeyserî kem û zor, çak û xirap sebaret be kurdîyan nûsiwe, be taybetî bayex danyan be Kurdistan le nîwey yekemî sedeyî nozdehem da reng û rûwaletekfî temahkarane û dagîkeraney wergirit, çumke hîç seyrî niye ke Kurdistan wek nawçeyekî stratejfî giring le roy siyasi û aborîyewe way lê kirdibûn ke çawî lê netro-kînen û le hemû rûwekî mêtjûyî û etnogirafîya û jîyanî komelayetî û roşenbîrî ziman û edeb û nejad û dûristbûn û peresendinî bizotnewey azadî netewey kurd di-wawe (1). Em witare her wek Dr. Ewrehmanî Haci Marif

Le nîfwey yekem û nîwerasîfî sedey nozdehem da hendêk le zanayanî Rusyayî Qeyserî wek Lîrx, Gizarov, Abovîyan û Sotsîn.....

Le roy ziman û folklor û mêtjû etnograffiyay kurdewe nûsi-nîyan bilawkirdûtewe diway şorişî Oktôberî 1917 kurdnâsî le Sovtey da xoy le bar û doxêkî dîda be dîkird, ke bê guman rîga baştır sazkira bo peresendin û geşepêdan û tuwêjînewey û lê kolînewey pitir, eme cige lewey dêwr û berfî çareke mîlyonek kurd le komarekanî Qafqâsi xowarroy Asyay Nawaerast da dejin û îmro jîmareyekî baş le zana û profosor û tuwêjer yan têda helkewtûwe ke be şêweyekî raste û xoy naraste û xo xerîkî berhem hênanî karfî za-nistekan sebaret be kurd û Kurdistan.

Ewey şayanî base eweye ke îmro le Sovyet ciwar melben-dî kurdnâsî heye le Mosko, Lenîngrad, Yerîvan û Baku ke kar û barf hemûyan pêkewe girêdrawêñ û lem melbenda-neş jîmareyekî baş le zana û profosorî rusî û Sovyetî û kurd kardeken ke taku êsta be sedan kitêb û namîlke û witar û nûshî be nîrxî babetayenan le ser mêtjû û etnografiya û zi-man û edeb û folklorî netewey kurd bilawkirdûtewe û cige leweş bedeyan xwendkarfî diktörayan ci kurd û ci sovyetî pêgeyandûwe ke ewanî xerîkî gelek karfî zanistanen.

Mamosta Kurdo yekek bo lew çend kese kurdey ke salî 1928 le Ermîniyâwe nêrdirane 'Kolîcî kirê karan' le Lenîn-girad û paş tawawkirdinî xwendinekeşî bîryarî da her lewê bimînîtewe û le salî 1941 da xwendinî diktörakeşî tewaw-kird. A. Orbelî ke yekek bo lew kurdnasaney bo beşî kurdfî Lenîngrad bo witinewey ziman û etnografiyay kurd bang kirabû, le salî 1959 da legel mamosta Kurdo ew çend kurd-nasey tir ke le beşî farîşî lay A. Fremen karyan dekird cû-da kirdinewe û beşekî taybetîyan be nêwî "KEBNEYETÎ KURD" ewe kirdewe, paş ewe Orbelî her le heman sal da koçî dûwayî kird û le salî 1960 we, mamosta Kurdo ew xizmete pîrozey ewî xiste ser şanî xoy û kira be serokî KEBNEYETÎ KURDî le Lenîngrad.

Ew karaney mamosta Kurdo nûşînî pitir le sed witar û kitêb û namîlke debin ke reng bêt le witarekey Dr. Cemşîd da hemûyan bixrêne pêş çaw. Mamostay nemir cige lewey zanayekî lêhatû bûwe le ziman û edeb û folkorda destekî balâşî le lê kolînewey mêtjû etnografiyay kurda hebûwe.

Jîmareyek le witarî sebaret be serincî û lê kolînewekanî X. Abovîyan û P. Lîrx û Eminî Evdal û gelek zanay tirewe bilawkirdûtewe. Yekek lew witaranay Qanatî Kurdo ke le jîyanî komelayetî û roşenbîrî ziman û edeb û nejad û dûristbûn û peresendinî bizotnewey azadî netewey kurd di-wawe (1). Em witare her wek Dr. Ewrehmanî Haci Marif

delê "birîtiye le kurtey kitêbekî gewre ke Qanatî Kurdo amadey çapî kirdûwe." Belam le rastî da taku êstaş çap û bilawnekirawetewe.

Sebaret be mîjûy kurdnasî rus û sovyet Qanatê Kurdo xawenî gelek berhem bûwe, bo numûne "pêşkewtînî kurdnasî le Sovyet" (2). "Karekanî P. I. Lîrx- le babet kurd nasîyewe" (3), "X. Aboviyan- weko kurdnas û etnografi" (4), "X. Aboviyan- zana û kurdnas" (5), "A. Orbelî" (6), "karekanî Emînî Evdal le barey etnografiyay kurdewe" (7).

Lew witareneda Qanatê Kurdo nîşanî dawe ke ew kurd-nase rus û sovyetyane le lê koñinewey mîjû û etnografiya û ziman û edebî netewey kurda cîgayeke berz û diyariyan le rojheltnasî da heye û hewleke zoryan dawe ke serbexo-yî ziman û edeb û mîjûy kurd le cîhan da derbixin.

Le meydanî kurdnasî da mamosta Kurdo hewlekî bê wiçanî dawe ke hemû leyenekanî dewlemend bikat û be şe-weyekî zanistane hele û kem û kuryekanî ta radeyekî baş dest nîşan bikat. Le biwari mîjoş da çend witarekî bê wêney bilawkirdûtewe ke ewey rastî bêt tenha 4 witariman berdest kewtûn ke ewanîş le jîr nawî "hendêk bîr û ray hele le barey ziman û mîjûy kurdewe" salî 1973 Dr. Ewreh-manî Hacî Marif le rusiyewe werî gerawnete ser zimanî kurdî û pêşekiyekî pir be nawerokî bo nûsiwe û le şe-weyî kitêbek da çap û bilawkirdûtewe (9).

Cige lewe witarekî tîrî be nêwî "Qelay Dimdim- dastanî qaremanetî kurd" le salî 1962 da le Mosko bilawkirdûtewe, belam berdestman nekewtûwe. Wata ew 4 witarey ke be dest manewen emanî.

\* Şêwandînî mîjûy Kurd le zanistî mîjûy burjuwazî farisi da.

\* Şîkirdinewey Belgekanî Kesnefot le barey Karduxekanewa.

\* Serincek le Namey Diktörakey Akopov- Rexney Mîjûyî le Meseley Nejadî Kurd da.

\* Çend Têbêniyek le Ser Kitebekey Vilcêviskî.

Ca lîre da wa kurteyek le nêwerokî ew witarane dexey-ne pêş çaw.

Ger mîjû birîti bê le zanistekî gewre û bekerek û diyar-kirdinî beserhatî heme çeşney jiyanî ademî zad û tomarr-kirdinî hemû al û gorekî siroş û komel û têgehiştînî qonakekanî imroyî û diyarkirdinî rîbâzi giştî dûwaro ji ewsa de-bînin cey daxe ke mîjû wek zanistî ew mafey pê nadirêt be taybetî le layen dewlete zilekan û rîjème diktatoriye-kan û deste û kesanî demargirî koneperest û burjuwa û şo-vînî ew welataneş ke fire netewen û bo mebestî parasını berjewendi xoyan û pitewkirdinî deselatî mîletî çewsîner da hemû hewlek dedin bo çewaşekirdin û ramalêni royî zanistaney mîjû.

Lem rowewe rîjème dagirkiranî Kurdistanî ci be xoyan û ci le rîy grupey burjuwa û şovenistî nûwêneryanewe kem û zor gingawîyan le çewaşekirdinî mîjûy bab û bapîranî kurd nave. Ger hesk kitêbe şînekey rîjème şovîniyekî Iraq "hukumeti nişîmanî û gîr û giriftî joro 1965" (10) bixwenîtewe, ewsa bê pena û pêç riq û kîney rejîmî erebî dagirkirî le Kurdistani Başûr da bo derdekewê ke gwaye "kurd le Iraq da nîn û ew jimarey kêmîtir le niw milyoneş ke hem biritin le komelêk xêl û hozî ser be komari niş-tîmanî û be zaraweyekî Erebi depeyvin û fîryan be ser kurdewe niye." Yan hendek le kitêbî Erebe şovîniyekan bo nimone Mihemed Teleb Hilal, Samî El-Xemrawî, Mah-mud Al-Dirre... hd (11) Diwayî bizûtnewey Kemalistekan û damezrandînî rîjîmî Tîrki le ser binçiney Turanism, Tur-kekaniş nek be tenha mîjûy kurdiyan çewaşê û şêwandûwê belko bûnî kurdîş wek mîletêk lay ewan le Turkiya nine. (12)




Her weha Farsekanîş çendyan bo kirawe mîjûy kurdiyan bo xoyan diziwe û çewaşê kirdûwe. Emes be aşkira le kitêbekey Reşid Yasemin şovînistî Fars da "Mîjûy Nejad û Peywestegî Kurd" (13) da bederdekewê ke mamosta Kurdo be hoy komelêk belgey mîjûy û zanistanewe be witarek welamî dawetewe.

Le gel emes da wenebêt ême dostane temasay ew Ereb, Turk û Farsane nekeyn ke ta radeyek be şe-weyekî mirovane le ser mîjûy kurd û nişîmanekey nûsiwyane, her wek Şakir Xisbak (14) û İsmail Beşikçi (15) û Arife Hesen (16) ... hd.

Mamosta Kurdo le witarekeyda sebaret be kitêbekey Reşid Yasemin nûsiwetî ke Yasemî her wek xoy delê "le ser dawekirdinî wezaretî roşînbîrî Eran nûsrâwe bew mebes-tey ke reges û yeketî mîletî kurd le gel mîletî Eran da, her weha yeketî mîjûyan û awkarî kurd le jiyanî Eran da nişanbidrê." Lîre dûbare eweman bo derdekewê ke hukumatî regezperistî Eran be niyazî hawzimanî û hawkarî kurd û faris, mîjû û zimanî kurd le reçelek da bi şêwenî û mamosta kurdoş le sertay witarekeyda destî bo ew rastiye rakêşawe û delê ke müsinî ew kitêbe bo siyasi hukumatî Eran bûwe."

Reşid Yasemî ke kurd be mîletekî resen û ciyawaz û xawen kultur û ziman û mîjûy xoy dananêt. Qanatî Kurdo be komelêk belgey mîjûyi welamî dawetewe ke Gotî-Kası û Loloî serçawey kurdî êstan û gelek le mîletî fars kontirin.

Kanatî Kurdo, be corêkî babetane kitêbekey Yasemî Şîkirdotewe û destî bo hemû ew şîwînane rakêşawe ke bê hiç belgeyekî mîjûyi Yasemî gereki bûwe mîjûy kurd. Çewaşê bi kat û tenanet birwaş be lêkolînewe û nûsînekanî zana û rojhelat nasekan ne kat. Kanatî Kurdo, ronî kirdotewe ke kurd le mîletî fars ne kewtotewe belko le encamî tekelaw bûnî komelêk le hoz û mîletanî kon ke le çiyakanî Zagros da jiyawîn peyda bûwe. Lew ruweşewe nawî çend hozêkî bo nimone hêna-wetewe wek: Kaskan "le nawî konî mîletî kasiyewe hatuve, ke le çiyakanî Zagros dejyan, Lolo " le nawî Lolo we hatuve, ke le xuwarûwî çiyakanî Zagros dejyan, Kurt le nawî Kurtewe hatuve, ke le ser roy rojhelatî çiyakanî Zagros dejyan, Xaltan..



MAMOSTÊ QANATÊ KURDO Y. ORBELÎ

Le nawî konf mîletî Xalidiyewe hatuve, Dasînî.. le nawî mîletî Tasanî wêk deçin, Takarî.. le nawî konf nawçeyî Tîkoriyewe hatuve, ke em nawçeye kewtote Xuwaroy Ermenistan, Zîlan.. le nawî zûy Zilonî yewe hatuve ke kewtûte xuwarûwî Ermenistan."

Her wek mamosta Kurdo rûni kirdotewe ke le yekçûnî nawî xozekeanî kurd û nawî mîletanî kon û nawçeanî Kurdistanî serdemî zû be rîkewt ne buwe, û zimanî kurdiş ne le zimanî farîsî kewtûtewe û ne le ser biçîney ewîş durûst bûwe wek Reşît Yasemî bê şermane deyewê bi selmînî belko Kanatî Kurdo delê: Le kutî durûst bûnda ( mebest mîletî kurd e. K. E ) gropî zimane Êranîyekan (nek tenha farsî) be ser gropî zimanekanî tir da serkewtuwe û le encamî em serkewtine da zimanî kurdî durûst bûwe û be gwêrey yasay muturbe yekê ke le zimane Êranîyekan." Cige le nûşnekanî Yonan û Ermen û Somer ke nawe rastî Kurdistanî êsta be cê nizirgey kurd dadenêt. Kanatî Kurdoş lem lê kolîneweyeye da şowêni peydabûnî kurd bem core destnîşan dekat ' le başûrewê her le deryaçey Wan û Wirmê we ta çiyay ZAgros, le xorhalebewe le rûbarî Diclewe, le xorawawe le Botan suwe."

Le layekî tirewe le nûşrawekanî Somer û Aşûr da (2000-1000. P. Z.) nawî hozî Kurtî yan Kurtî ke le xuwarûwî rojhelatî nawçeanî Zagros da jîyâwe berçaw dekewê. Le nûşrawekanî Naramsîn da dewrû berî ( 2500 P. Z.) nawî xozî Lolojî " Lolo ", Gurtî ke le nîwcê saxawiyekeanî Zagros jîyawin debînrê. Em Lolo her wek Q. Kurdo rûni kurdutewe " le zanîst da be eslî Lorr nasrawe û xozî Gurtî

şêweyekî nawî Kurtî ye ke le hendê nûşrawda berçaw dekewê." Her weha be pêy belgekanî Exêmên da le nêwan ew mîletaney ke dijî leskerî Daray paşay Fars da cengawîn, Qanatî Kurdo delê ke nawî mîletî Sagartî yan Sakartî yan Zîkortî ke le nîzdsîk Erbilewe jîyawin ber çaw dekewi."

Lew çend nimûnaney serewe da bo man derdekewê keta ci radeyek mamosta Kurdo xoy mandû kirduve be komelêk belgey mîjûyi welamî bîr û ray şowenistî farîsî le kitibekey Reşîd Yasemî da dawetewe. Her weha bo yekem carîse ke belgekanî Keznetonî Yonanî sebaret be Kardo-xekan şîkirdotewe û lem ruwewe destî dirêj kirduve bo serçawekanî Mehemed Emîn Zekî û Wasîl Niktin û hindekî tir. Q. Kurdo, be tundî dijî ew helwêste çewtaney Y. Maro, G. B. Akopov dewestê ke bê hîç belgeyekî zanîstî wîstûyane le rûwî zimanewaniyewe mîjûy kurd bi şêwînin. û lew barewe delê " cêy sersorman eweye ke Akopov şarezayî zimanî kurdî nîye, çûnîyeteî dirûst bûnî zimanî nazanê, şarezay wişekanî û mîjûy pêşkewtinî edebî kurdî nîye, ke ci hewlî dawe nîşanî dewrekanî pêşkewtinî zimanî kurdî bidat."

Ci Akopov ci Vilcivîskî gerekî buwe ewe rûn bikenewe ke ew Kardoxaney Keznefon nawî hêrawin hîç peywendiyek yan be kudî êstave nîn. Bo selmandînî Kardoxekanî bab û bapîranî kurd Qanatî Kurdo le roy zimanewaniy ber le hemû şitêk lê kolîtewe be hoy jîmareyek le serçawey mîjûyî û zanistane welamî witarekey Vilcivîskî dawetewe ke le jîr nawî " Kurd, seretayek le mîjûy etnografi gelî kurd." ke le salı 1961 da bilawî kirdotewe. Çunke aşkiraye ke yonanîyekan duway şandîyan û geraneweyan be wilatî Kardoxiyekan da têperbûn. Her weha bo selmandînî ewey ke Kardoxekan zimanî taybetî xoyan hebûwe. Q. Kurdo, delê " encamî hemû gelgekan Keznefon derbarey peywendî û giftûgoy yonanîyekan le başûrî wilatî Kardoxewe, her wehaş le naw wilatî Kardox da be aşkira ewe rûn dekatewe û nîşanî dedat ke le rîgây wergêrewê giftûgo kirawe û şêwey giftûgo kirdinî yonenekean le gel Kardoxekanda hîç çiyawaziyekî le gel şêwey ew giftûgoy da nebûwe ke le başûrî Kardox da kirawe." Bewey sereweda boman derdevekewê ke Kardoxekan wek mîletekî ciyawaz xawenî hêz û deselaftî xoşyan bûn ke Keznefon le Enabasis da bê pena û pêç basî kirdûwe. Ca wek Q. Kurdo şîkirdotewe ke " Yonanîyekan bo ci cêbecê kidinî kar û barî xuyan le gel Kardoxekan da xawenî wergêri xoyan bûn ke le zimanî Kardoxiyekane we şîti bo wergêrawne te ser zimanî Yonanî."

Her weha Q. Kurdo destnîşanî ewey kirduve ke tako êsta ew kesaney le mîjûy Kardoxekan koşîwûnetewe, le rûy zimanîyewe hîç lê kolîneweyekan nekirduve. Bo nimûne Reşîd Yasemî û Vilcivîskî û Adons û hendekî tir debêjin ke guwaye Kardoxekan be zimanêt diwawin ke le zimanî Ermenîyewe nîzdsîk bûwe.

Bê guman ew kesaney le rîgâyekî çewt û bê belgey zanîstî Kardoxekan degérnewe ser farsî û Ermenîyewe. Boye lêreda rûyekî gîringî dikey em witarey Q. Kurdo leweda bedî dekeyn ke Kardoxekan lêdekolîtewe û nişanî dedat ser be ci xêzanekî zimane û lew rûwewe telê " wişew KARDAK, KARDOX manayekî komelayetî û etnografiyan hebûwe û le ser biçîney zimane Êranîyekan dirus bûn... Eger waşey Kardox le zimanî Ermenîye we ketibetewe, ewe duwa encam eweye ke debê Kardok be zimanî Ermenî we, Kardox be zimanî farsi yekkewtibin wek nawêk ke be mîletêkyan witibî û wek nawî mîletê ke xoy be xoy witibê." Her weha Q. Kurdo bepêy hen-

dêk gramatîkî ziman Kardok û Kardox degerênenetewe ser xêzanî zimane Éranîyekan û bapiranî êstay kurd. Sebaret be kitêbekey Vilçiviskî " Kurdekan" mamosta Kurdo witarekî taybetî le ser nûsiwe û têyda destnisanî helekanî nûserî kiduve û Q. Kurdo nek her pêy waye ke Vilçiviskî hemû belgeyekî zanistî şewandîwe, belko zorîşî la seyre ke nûserî keresteyek entropoloji û etnografi û cografî be keresteyek nazanê bo rûnkirdinewey mêmüy dirustbûni mîletan û bitwanrê piştî pêy bibestrê," her weha lew rûwewe Ekadîmyay zanistî Sovyetî kirdote nimûneyekî zindû ke smojgayekî entropoloji û etnografi têdaye û zarayan xoyan be lêkolîneweyewe xerik kirduve, layekî dewlemendî tîrî em wutarey mamoste Kurdo lewada be dî dekre ke zor xoy mandî kirduve û gerawe be şwêni jimareyekî zor le belge û rûdawî mêmüyî û entropoloji û ethnografi û zimanewanî bo nişan danî rewîst û nerêt û ziman kulturi û mîletî kurd û carekî tîrîş rû le Vilçeviskî dekat û delê: " Le ciyatî çûnyeti şewey komelatetî û dirust bûni lay mîletî kurd, le ciyatî yekalakirdinewey çûnyeti jîyan û rewîsti nawxoy kurdewari, le ciyatî lêkolînewey le pêşkewtin û dirustbûni mîletî kurd, Vilçeviskî xoy be rûnkirdinewey meseley şewey komelatetî û mêmüy mîletanî konî rojaway Éran û Asyay biçûk û piş Qefqasewe xerik kirduve. Lem rîgâyewe wistûyetî ew şitey kurd le diraw sêkanî dece nişanî bidat. Bê guman girtînî rîgâyetî wa çewt û yet la le lêkolînewey meseley etnografîy hîç mîletek bêt, nûser tûşî gelek hele dekat û ew lêkolîneweye nirxekî zanistî nabêt û bê sôd demenêtewe." Le layekî dîkeşeme Q. Kurdo zor lesor xo bo Vilçeviskî û ew kesanesh ke her wek ew bîr dekenewe şikirdotewe ke le hîç qunaxêki mêmü da kurd xoy be Ereb danenawê û zimanekesî hîç firêki be gropey Samiye we niye, çunke Vileçeviskî be herçî mebetek buwe gerekî buwe biselmînî ke kurd hîç şitêki taybetî xoy niye û tenanet dijî bîr û ray V. Minoriske ke delê " Mad û mîletanî konî Éran serçawey kurdî emron." Mamosta Kurdo hendêk car naçar buwe her le peydabûni kurd û nawe konekanî û çêga û şwêni, ziman û etnografîy bikolîtewe le nokeve biselmîrin ke kurd mîletekî sebexoye û lankî kulturi mîletanî rojhelate û lew ruwesewe nûsiwetî " ew bawerey zanayan heyane derbarey ewey ke hîç belgeyek niye bo nişan danî peywendi etnografi û zimanî le nêwan kurdî êsta û xêlesamiyekan û erebekan û yafeti û turkekan da, Vilçeviskî emane be rast na zanê û hewl dedat be herçî çesnêk bê le naw kurda şifek her bidozîtewe ke lew rîgâyewe kurd bika be xixim le gel ew mîletaney ke nawman birdin. Vileçeviskî hîç rûnkirdinewey û belgeyekî niye bo dijayedî kirdinî bawerî rast û çespawî ew zanayaney ke kurdî êsta be newey Mad û Kardox dadenêt û le heman katışda dijî tiyoriyekey V. Menoriskî westawê." Yekek lew kesaney tir ke le grûpey Vilçeviskî û zor narewa mêmüy kurdayan şewanduwe Akopove, ke mamosta Kurdo merdane be witarekî pir le naverok û zanistaney le jêr nawî " Serinçêk le nûsravekey Akopov, rexney mêmüy le meseley nejadî kurda da" welamî dawetewe. Lîre da Q. Kurdo dû xalî giringî le nabewy dukturakey Akopov destnisan kirduve " lêkolînewey û rexne" lew tiyoriye çiyawazaney derbarey nejadî kurd hen. Q. Kurdo delê " ke Akopov nûsravekey be tiyori borjoway Hend û Ewrupayî û Xafêti û Samî û şovêniyetî Éranî û Turkî derbarey mêmüy û ziman û edebî mîletî kurd dewlemend kîruwe û her le seretaşa be di dekrê ke xudî nûsraveke neytwaniye le dukturakey da serbikewe " le layekî tirewe Q. Kurdo delê " her çende Akopov gelek serçawey heme çesney be karhênawê, belam bedaxewe peywendiyan le gel lêkolîneweyek da niye, cige lewe hendêk nûsravî lawazî dûr le zanyarî be karhê-

nawê ke be hîç corêk peywendiyan legel basekey ew da û ne legel zanistî mêmü niye. Ew serçawaneş ew nûsrawanen ke bê hîç belge û çespandinêk derbarey nejadî kurd dedwê." Ew serçawaney ke Akopov be karhênawin wek Q. Kurdo delê " Serçawen edebî û yadişti gerokekan û raportî fermangakanin ke natwanin bibne kereste û piştan pê bibestrêt bo lêkolînewey le mêmü nejadî mîletî kurd." Tenanet mamosta Kurdo lem witarey da geyştote ew bîr û rayey ke Akopov raste û xo û na rast-e û xo wistûyetî le binçine da ziyan be kurd bigeynê û xizmetî dijminanî kurd bikat, lew ruwawe delê " Akopov le nûsinekey da tenha wistûyetî ke agir bo şovîniye Ereb, Turk û Fariskan xoşkat ke tako kurd be neteweyekî rese û serbexo xawen mêmü û kultur û zimanî netewayetî xoy da nenê û le heman kat da harî siyasetî Turkiya û Éran de dat bo le nêw bîrdinî mîletî kurd."

Duwa car mamosta Kurdo nûsravekey Akopov bem core nirxanduwe ke " le Şewey namey dukturîda niye bo wergirtinî şehadet dukturî naşet."

Bem core debînin ke mamostay nemir Q. Kurdo zanayekî gewre û qelayekî sext û kurdperwereki têkoşer buwe le beşî kurdnaşî Sovyet da û merdane dijî hemû helwêst û nûsin û bilawkiraweyekî çewtî dûr le rastî dij be netemek key buwe ca le layen her kesê kewe nûsrabêt.

Nirxî em witareney Q. Kurdo le we dan ke bo yekem car le rûyekî zanistiyewe be hoy jimareyekî zor serçawey û belgey mêmü giringêwe layenekanî peydabûni kurdî le seretawê şikirdotewe û be wîrdî le regezî kurd û nawe corawcorekanî zûy koliwetewe û layene zimanyekanî tiwêjiwetewe û paşan Welamî şovêniştekan û ew destew teqmey dawetewe ke le rîgây kurdnasiyewe wistûyane mêmü nejadî kurd çewaşe biken û be Ereb, Turk û Farsîyewe bîlikîn û wek mîletêki ciyawaz hîsabî bo neken. Bîr û ray zanistane û babetaney mamosta Kurdo man le we da bo derdekewê ke çawposî le hîç heleyekî ew kesa-ne ne kirduve û xizmetekî bê endazey be beşî zanist geyanduwe û bûye boman heye bêjîn ke em lêkolînewey Q. Kurdo bew çesne zanistiyê lesor mêmü konî kurd dako êsta kem wêren. Cige lewney ke mamosta Kurdo wek zanayekî bê layen lêkolîwetewe. Le heman kat da hestî netewayetî be corêk le karekanîda debînre ke bo hênanedî ew berheme babetane gelek xoy mandû kirdibêt û le encamîş da serkewtineki gewre be dest bine.

Ca bê pêç û pena detwanin bêjîn ke mamostay nemir bew komele witarey ke lesor mêmü kurd nûsiwetî bîr û ray kurdhayetî mamosta Kurdo û dil sotanî be mêmü û edeb û zimanî neteweyekî be diyardexat, hestî qolî neteweyî O. Kurdo nek her lew witaraneda û kare zanistiyekanî tîrî da be derdekewî belko hels û kewt û jiyanî rojaneşî deman xate ser ew bîr û rayey ke bêjîn mamostay nemir birîti bû le qatabxaneyekî kurdewari û rî nişanderî deyan xwendkarî kurd ci le bawerî zanist û ci le bawerî bir û ray resenî neteweyîda.

Hizar silaw bo giyanî pakî mamostay nemir QANATI KURDO !

1- Kitêbî " Milletanî Rojhelat Nawerast" Mosko- 1957 L 242-260;

2- Namey Zanayanî Anglojî Rojhelatnasi 1960 B. 25 L. 57-67

# SERXWEŞIYA MALBATA Wİ

## Ü KURDNASAN

GELİ XWENDEVANEN HĒJA!

LI JĒR MESAJĒN KU JI MALBA-  
TA QANATĒ KURDO, KURD-  
NASĒN HEVALĒN Wİ Ü UNÎVER-  
SITA Wİ RE HATINE ŞANDIN  
EM PÊŞKEŞİ WE DIKIN.

Bi dilē kovan tevi ve şına Qanatē Kurdo dikin, ku ji demē zütir me undakir. Emekē Qanatē Kurdo di dereca pêşvabirina kurdnasye ü çanda gele kurd pîr mezine.

Nav û karê wî wê heta-hetê dilē meda bimînê.

Akadêmikê Akadêmya komara Qazaxistanêye Zenyaryê, Nadîrê Ke rem Nadirov.

Bona mirina zanyarê mezinî nav û deng, kurdnasê hizkiri Qanatê Kurdo bira serê we xweşbe. Nav û karê Qanatê Kurdo wê heta-hetê dilē meda bimîne.

Proffesor Sihidê İbo

Ji jyanê xatrê xwe xast kurdnasê Yekîti Sovêtîyê pêşîn. Tenê bi hevgirtina komelê gişkî em dikarin qet na hevekî dewsa wê undakirinê bigrin. Ez gazya wê yekê dikim. Tîka dikim serxweşyê bidne pîreka wî û kurê wî.

Sûkêrman, kurdnas.

Bi dilekî kovan bona mirna zanyarê nav û deng, şuxulvanê cîvakî Qanatê Kurdo yî qedirbilindî, hizkiri serxweşyê didme we. Bi mirina Qanatê Kurdo yê ku bi karê xweyî pirsale çawa serokê koma kurdnasê Lêningradê emekê mezin rêt bona pêşvebirina kurdnasye kurdnasye ziyanike mezin kişand. Nav û dengê kurdnasê mezinî qedirbilind wê heta-hetê dilê gelê kurda bimînê.

Proffesor Hecyê Cindî

Xebera xirab gihiştê me û em gelek xemgîn kirin. Qanatê Kurdo yek ji mezintirin zanyarê kurd bû, xizmeteke mezin bi gelê kurd dikir. Mirna wî ziyanike pir mezine ji bo miletê kurd. Serê we hemûyan xweşbe.

Enstitûya kurd li Paris

Ji ber mirina Qanatê Kurdo em êşa xwe, kesera xwe nikarin bînne ziman. Bona pêşketina ziman û çanda kurdi

bi camêri û dostanî destê xwe gihad-ye me û bûye yek ji me. Bira serê we û serê gelê kurd xweşbe.

Kovara 'Roja Nu'

Koçî duwayik Qanatê Kurdo Kûrdo-yê hewalekî nexoş bû bo roşinibrabi kurd. Hemû li gel tan peyarebarin.

Desteyî nûsaranî 'Çirikey Kurdistan' Ibrahim Ahmed, Muhammed Resûl Hewar, doktor Kemal Fûad.

Koçî duwayik Qanatê Kurdo Kûrdo-yê ziyanekî gewre bû li kultûrî kurd, xemtanin;

Dr. Kemal Fûad, Yekîti Nişîmanî Kurdistan.

Bi mirina hozanê mezinî kurd xisareke mezin giha gelê me. Em tevi êşa we dibin û serxweşya we dixazin.

Malbeta Cigerxwin

Hevkar û şagirtên Qanatê Kurdo, bi windakirina mamostayê pir mezin gel Sovyetistanê û gelê Kurdistanê xisaneke mezin dît. Bira serê we xweşbe.

Publishing house of Kurdistan, Henevi Çelepli.

The death of the distinguished prof. Qanatê Kurdo is a great loss to the kurdish people and its cultur. His contributions will be ever alive in the memori of our peopl. Pleasa acoopt our condolences.

Kurdish culture centrer, London

Ji malbeta Kurdoevra,

Xeberek reş disa gihişt me. Disa ewledeki gelê kurd, yê bi nav û deng çû ser heqya xwe. Dilê me bi êşa giran tîjî bû. Li Qanatê Kurdo herdem li her cî li cem meye. Yênu ku bo gelê xwe, bo aştî û azadyê tê koşin dayine, xebitîne, nayen bûkirin. Qanatê Kurdo hertim di dilê gelê kurd, di dilê keç û lawêne Kurdistanê wê bijî. Bira serê we û serê gelê kurd, xweşbe. Hûn di xweşyêda bimîn.

Komkar, Koln

Ji bo melbeta Qanatê Kurdo,

Xûşk û birayê hêja, xebera windakirina mamostayê mezin gihe me û dilê me gelk pê şewitî. Qanatê Kurdo, yek ji ewleden gelê kurd, yê mezine, ji

çand û edeba gelê mera xizmetek mezin pêk aniye. Jiyana xwe di xizmeta gelê xweda derbaz kirye û bi dû xwe efrandinê hêja hiştîne.

Merivekî usa hêja tucar nayê ji bîrkirinê, ewê tim di dilê dîroka gelê meda bijî, xebat û efrandinê wira giyana me bilind dibe. Serê we û serê me hemûya saxbe.

Kemal Bûrkay, sêkrêtârê giştî, yê Partya Sosialiste Kurdistanê Tûrkyay

Ji navê Yekîtiya jinê kurd li Lênin-gradê Gulistan,

Nadêjda Vasilîvna Berêz, hevalno, sala buhuri bona gelê kurd saleke pir giran bû. Gelê kurd cêrgê lawê xweye pir mezin, nav û deng unda kîrin Yilmaz Guney, Cigerxwin, Tofik Wehbî, Aladdin Sucadi. Iro ji em xatrê xwe ji laweki gelê kurdî mezin dixazin. Doktorê zanyarya filologyê, profesor, endemê kara, yê Akadêmya kurda li komara Îraqê, yek ji himdarê Instituta Kurdi li Parisê, Qanatê Kurdo Kurdayê.

Qanatê Kurdo jiyana xwe gişk rewayı pêşvaçûna kurdnasya sovêtyê kir û bi wî kari cîhanêda nav û deng qazanc kir, hate naskirinê DMea gîfî tê ser kurdnasya sovêtyê; em beri gişkî navê Qanatê Kurdo bîr tîmin. Nenhêrî sinora, têrorê û hasûgeha nav û karê wî idî mejya derbazî herçar perçê Kurdistanê bû û bûne hebûna gelê kurd. Gelê kurd bi lawê xweyî hêja serbilind bûye û wê vir hada ji serbilindbe. Iro, dema dijmînê gelê kurd bi feşkirina (falsifikasiya) dîrokê dibêjin kurd tîrkin, farzin, erebin, nivîsarê Qanatê Kurdo di şerkarya gelê kurde bona xwexweykirina netewyê çek û silahê giranbihane.

Qanatê Kurdo bîstî zedetir kurdnas amade kirin, ewê iro li bajarêd Yekîti Sovet û çend welatê Rojhilata Nêzîk û Avropayêda bi serfinyazî pirsê kurdnasyêva mijûl dibin. Em xwendkarê kurde, ku bi saya siyaseta Yekîti Sovete intérnasionalyê li bajarê Lê-



75 Saliya Qanatê Kurdo tê pîrozkirin!

ningradê xandina bilind distînin, me timê xemxurya wiye mîna ya bava texmîn dikir. Derê mala wî herdem ber me vekirî bû. Tevbûna tevî wî patr-yotê wîlâtê sovîtyê, intérnasionalistê mezin timê kîfa me danî û bandûra here baş ser me dihîst. Em tu cara şêwra wî bûr nakin; baş hînbin, bivne pêşekzanê baş û bi rastî xizmeta gele xwe bikin.

Yasin, ji nave AKSA;

Hevalê berêz, Ez ji navê Komela xwendekaranî kurd li dervayî welat sexweşyê didme bona mirina Qanatê Kurdo serxweşyê didme malbeta wî, gewm û pîsmamê wî, temamya gelê kurd. Piştî nexweşya xedere, dirêj xat-rê xwe ji jinê xast zanyarê zor mezin, yek ji hîmdarê kurdnasya sovîtyê, endemê kara, yê Akadêmya kurda li komara Iraqê, himdareki Institütâ

Kurdi li Parisê, proffesör Qanatê Kurdo. Jîna Qanatê Kurdo 76 sal dom kir, ji wan sala ewî bêtîrf 50 salf dîyarî xizmetkirina gelê xwe, zanyaryê kir. Ewî sedî zedetir nîşârê zanyaryê çap kirin. 45 sala Endemê partya Lînîn bû û cêrgê wê partyayêda ewî jîyanike mîransye, paqîj derbaz kir. Ji sala saz-kirinê, heta roja jîna xweye dawye ewî seroketya koma kurdnasyê dikir.

Hevalno, gelek pêşekzanê ber destê Qanatê Kurdo hînbûyi, niha li Kurdistanê û çend welatê mayin bûne kurdnasê nav û deng. Qanatê Kurdo çawa zanyar û bajarvan her tişt dikir, bona pêşveçûna çanda gelê kurd.

Nav û karê Qanatê Kurdo, lawê gelê xweyî dilpak û zanyarê mezin, wê heta- hetayê dilê meda bimîne çawa nimûna xizmetkirina bona gelê xweye bi tam.

Ibrahim, ji navê rîexistinê Kurdo li Mosko,

Dost û pamamû berêz, hevalno, Iro em xatrê xwe ji zanyarê sovyê-têyi nav û deng, kurdnas, proffesör Qanatê Kurdo dixazin. Qanatê Kurdo gele sala di dereca ziman, edebyet, dîrok û netewanasya kurdîda kar kirye. Çawa dihare ewî jîneke dijar derbaz kir, lê ewî ji wê jîne xwe 53 sal dane karê pêşvabirina kurdnasyê û nava wan salada weke 100 gotyarê zanyaryê, 20 monografya, 7 kitêbê dersa seva dibistanê kurdê Yekîti Sovêtî nivî-sen. Ewî pey xwe ferhengê kurdi-rusîyê gelek giranbiha hiştin Qanatê Kurdo kareki mezinkir di dereca pêşvabirina ziman û edebyeta kurdi û hilbet mirna wî zîyanike mezin bû seva gelê me û bi taybetî seva çanda wî. Dijware

emekê Qanatê Kurdo gişkî bîr bînîf, lema ji bi saya wî emekê mezin navî wî ne tenê li Yekîti Sovêt, lê usa jî Kurdistanê gişkî û nava rojhîlatnasê cîhanê eyan û deng bû. Qanatê Kurdo pir şagirt, pêşekzanê xort amade û perwerde kirine. Ew şagirtê wî çawa kurdnasê merifet hatine nas kiranê. Ü em bawarin, wekî şagirtê wî, bi serfinyazî karê mamostayê xwe pêşda bivin.

Qanatê Kurdo lawê welatê xweyi sosyalistîye hêja bû, dema Cenga Niştimanyêye mezin ewî heta roja altindaryê dîjî dijiminê welatê xwe şer kir bi mîranî û bi ordîn û mîdalava heta rewarikirin. Komûnist û patryûtê welatê xweyi dilgerm, yek ji wan mervê pêşin bû, ku nava gelê kurdda bir û bawaryê marks-lêmînyê belakîrin.

Hilbet Qanatê Kurdo hê dikaribû karê xwe pêşda bibira, kîri, gelê xwebihata. Lî talebextara me ew unda kir. Lî em baş zanin, wekî bir û bawaryê wî wê hê gelek sala dilê gelda bîminne.

De bi xatrê te mamostayê hizkirî, bîranina teyê ges wê heta-hetê dilê meda bîminne. Em, xwenkarê kurde li Yekîti Sovêt dixwinin iro sond dizun, wekî emê her tişîf bikîn bona xastina weye here mezin, hevgirtin û yekîtya cêrgê xebatkarê kurd, bona dûwaroja gelê meye ges, binne sêñî.

Ji navê asosasya xwendkarê kurd li Lîmîngradê;

Hevalno em iro xatrê xwe ji Qanatê Kurdo dixazin, ew hebye û wê heta-hetê bîmîne çawa merivekî lapi hizkirî. Gelê kurd ziyanekê pir mezin kişand. Doktorê zanyarya filologyê, endemê kara, yê Akademya kurdaye komara Iraqê, yek ji himdarê institûta Kurdi li Parisê. Qanatê Kurdo, mervê dilpaqî, dilovan, kareki pir mezin kir di derca kurdnasyêda. Ewî usa ji emekî mezin kire nav karê qewinkirina pevgirîdanê gelê sovîtyê û gelê kurd. Ew bi xemxurike mezin berbiri me, xwendkarê kurd dibû.

Ji navê komela xwendkarê kurd li bajarê Lîmîngradê ez serxweşyê didime malbet, qewm û pismamê Qanatê Kurdo.

Ewê heta-hetayê dilê meda bîmîne.

Smirnova Irayida Anatolîvna, doktora zanyarya filologyê, institûta Zimanianyê.

Nadîjda Vasilîvna hizkirî, pisma-med berez, hevalno!

Îro em xatrê xwe heta-hetayê ji Qanatê Kurdo, kurdnasê herf mezin, şuxulvanê civakyeyê, komûnist û bajarvanê sovîtyê dixazin. Ez şagirteke

Qanatê Kurdom. Qanatê Kurdora li hev dihat nava merivada hizkirina berbi kurdnasyê pêşda bine. Gelek ji me xweyê pêşê mayin bûn, hinek afxannas hinek pêşekzanê zimanê farsi, lê dema civinê zanyari Qanatê Kurdo hizkirinekî usa berb. kurdnasyê, berbi gelê kurd pêşda danî, wekî paşê kurdnasi dibû karê jiyana me bi gişî. Qanatê Kurdo ne tenê em hîshî zimanê kurdî dikirin, lî ewi em usa ji hîns amnayı, hizkirinê dikirin berbi kurdnasyê, berbi gelê kurd.

Kurdnasî nava frannasyêda cîkî taybeft digre, ji ber ku ez xizmeta geleki dike, yê bona karê heri rast, bona azaşa xwe şerkaryê dike. Ü Qanatê Kurdo em hîndikirin timê dikire bira me weki tenê ew merivê vê yekê têdigihîjin, texmin dikin, ew dikarin kurdnasyêva mijûlbîn. Raste Qanatê Kurdo tê hesabkirin zimanzan, lî ew bi serfinyazi usa ji mijûlî netewenasi (etnografiya) dirok edebyet, û diroka bizavê gelê kurde netewyê azadaryê dibû. Ewi gelek baş serkanyê kurdnasyê zanibûn, ew serkanyê ku ewqas pirin. Lema ji bi her pîrsê kurdnasyê em dikaribûn berbiri wi bibûna û bersiva tam bistanda.

Dora Qanatê Kurdo timê keç û xort ew hiz dikir. Ew bi xwe timê xort bû, çavê wi yê xûorta bûn, giyana wi ya xorta bû.

Amûşgar, mamostayê bere û xoşevisti me. Eme rîgayî to ta axir dibeyin ser.

Bi xatrê te Qanatê Kurdo.

Zerî Yûsîpva.— Vê demê, gava em xatrê xwe ji Qanatê Kurdo dixazin, ez dixazim ji navê şagirtê wi gişka, ewê iro virin, yêd nikaribûne bîn, serxweşyê bidime qewm û pismam, dost û hevalê Qanatê Kurdo. Serxweşyê didime wan hevala gişka, yêd ji gele bâjara hatine, weki tevi şîha mebin. 25 sali zêdetir bi seroketya Qanatê Kurdo em mijûlî kurdnasyê bûne û nava wan sala gişki em ser êginayî û karhizya wi zendegirti mane Kürdnasekî lapi ewi bê hempe karê xwe hiz dikir, gelê kurd û çanda wi hiz dikir. Ser riya xwe ew rasti pir dijwarya û hasêgaha sihat, lê wan dema êginaya wi ducar, sêcar dibû. Qanatê Kurdo timê mera digot wekî bexteware, ji ber ku xizmeta gelê xwe dike. Ewî timê mamostayê xwe û bi taybeti İosif Orbîli bir danîn. Bona Qanatê Kurdo pir giran bû tragîdya gelê kurd, lê ewi timê bawarya xwe azaya wî danî. Hîmadarekî kurdnasya sovîtyê, destanînê wê kurdnasyê heta îro ji berî gişkî navê wira têne girêdan. Qanatê Kurdo xudanê nîvîsarê binaxyê di derca zimanianyêda pey xwe usa ji mirateke giranbiha hişt derecê

netewenasi, edebyet, dirok û diroka şerkarye gelê kurde netewyê-azadar-yêda. Navê Qanatê Kurdo tîf zûda ji sinorê welatê me derketye. Li Kurdistanê derheqa Qanatê Kurdo da gişk zanîn karker, zanyar, gündî, xwendekar û bi taybetî keç û xort. Qanatê Kurdo pir kurdnas amadekirine û em şagirtê wî, emê her tişîf bikin, weki karê wi destpêkî pêşda bivin, weki kurdnasya sovîtyê disa usa pêşbe, çawa dema Qanatê Kurdo.

De bi xatrê te seydayê meyi hizkiri.

Birqe

Ji navê Înstitûta Rojhîlatnasyêye Akademya Zanyaryêye Yekîti Sovyet em bona mirina rojhîlatnasya Sovyîtyêyi nav û deng, doktorê zanyarya filologyê, profesor Qanat Kurdooyêv dilêşî û xemginya xwe elam dikin û tîka dikin serxweşyê bidne neferê mala wî.

Primakov, Gankovski, Gasratyan;

Kolêktîva institûta Rojhîlatnasyêye Akademya Zanyaryê ya komara Ermenistanê bi dilekî kovan seva mirna kurdnasya mezin, doktorê zanyarya filologyê Qanatê Kurdo Kurdooyêv şinê dike. Emekê rehmeti di dereca pêşavabirina kurdnasya Sovyîtyê pir mezin bû. Piralya şuxulvanya wiye emekê dereca amadekirina kadre kurdnasyê, nav û dengê wî çawa li welatê me, usa ji ji sinorê wi der belav kîrin. Qanadê Kurdo, zanyar û mervê mezin wê heta hetê dilê meda bîminê.

Sarkisan, Şekroyê Xudo.

Em bi dîlkovsnî serxweşyê didne koma kurdnasa û neferê mala Qanatê Kurdo, bona mirna rojhîlatnasya, kurdnasya nav û deng, dostê meyê hizkiri. Ü Înstitûta Rojhîlatnasyayê Adîrbêcanê, akadêmik Bûnyativ.

Rojhîlatnasya Gurcistanê bi dîlkovani şîna kurdnasya dinêyeyan, profesör Qanatê Kurdooyê dikin û serxweşyê didne neferê mala wi.

Dirêktor, Gamkrêlidzê

Kolêktîva rojnama 'Riya Teze' besa mirina kurdnasya Sovyîtyeyi nav û deng doktorê zanyarya filologyê, profesör Qanatê Kurdo bi dîlkovani bihist Em tîka dikin bi navê me serxweşyê bidne neferê mala wi.

Rîdaksyonâra rojnama 'Riya Teze'

Rojhîlatnasya Zenîngîha Lîmîngradê bi dilekî kovan berbi riya dawyê verê dikin Qanatê Kurdo, xwendkarê Za ningehê, hevkar û hevalê baş zanyarê mezintir, yê ku nav karê wî, şuxulvanya wiye zanyaryê ya pêdagogyê, 50 salê pêşvaçûna kurdnasya Sovyîtyê û çanda gelê kurd xemilanidine.

Dê kanê fakültêta Rojhilatnasyê, Prof. Bogolyubov.

Bi dilekî kovan me besa mirna Qanatê Kurdoyi hizkiri û qadirbilind bihist. Bi mirna zanyarê pir mezin, kurdnas, şuxulvanê civakyê, mamestê nav û deng gelê kurd ziyanêke pir mezin kışand Qanadê Kurdo jiyanêkê mezin û pir hêja derbaz kir. Nav û karê wi wê heta, hetê dîle gelê kurdda biminê.

Rêdakşyona belavkirinê kurdî, ya radyoya Gurcistanê.

Beşi niviskarê kurd, ya Yekitya niviskarê Gurcistanê bi dileki kovan besa mirna teşkildarê zanyaryeyi zîrek, ronakbûr û pêdagogê dinêeyan, zanyarê ku kurdnasya Sovêtê û kurdnasya cihanê bi nîvîsarê xwe dewle-mend dikir. Qanatê Kurdoyi geleki hizkîrî bihîst. Mirna Qanatê Kurdo şeva kurdnasya cihanê û 20 milyon gelê kurd Zyanêke pir mezine. Serê we xweşbe.

Baxçoyê Isko, Ezizê Isko.

Olêg Fêyodoroviç Akimûşkin, serkê para İranyê, doktorê zanyarya filologyê. Qanatê Kurdo bi alavi gelê xwe hiz dikir û ew yek usa bû, ji ber ku ew lawê wî gelî bû, ewi pêşê xwe pir hiz dikir, ziman, çanda gelê xwe hiz dikir ji ber ku bi xwe kurd bû. Lê ez dixa-

zim bêjim, wekî ew çawa zanyar (ulmdar) pir mezin bû, zanyareki patriot û internasionalist bû. Gava ewî disertasya xweye doktoryê pawandikir û demekê ez wî tenê man, ewî minra -Hilbet min xwes tê, gava derheqa destanîn û mîrifeta minda tê gotin, tê gotin derheqa xastina mine mezinda dighijme nîta min danye pêşya xwe. Lê gelo ezê bighîjyama vî gişkî, eger dewleta sovîtyê ninbya, welatê meyîzor ninbya, partya me ninbya. Bir nekin, ewi ev yek ne ji dikê, ne li civîna mezin gotye. Ew bi rastî endemê partya meyîz hêja bû. Ewî bi rast û sert rînişa partyayê pêşda dibir. Ü komûnistî para me ew xetê xeysetê wî bilind qimet dikirin û dehe sala pey hev ew dijbartin çawa sêkrêtarê teşkîla parameye partyayê. Ew salê lape dijwar bûn seva rojhilatnasya mLêñgradê û salê lape geş; ji ber ku wan sala rojhilatnasya me xwe digit 3 nimûn:

1. 1953-54 s., ez bi taybîfî van sala tîmîmê bîr, gava pirs hate daninê, wekî destnivisarê para me, destnivisarê kitêbxana ser navê Saltikov-Şçêdrin û kitêbxana meye giranbiha ji Leningradê ciguhesti bikin. Hema ew, Qanatê Kurdo, lê ne mervê wê demê hê nav û deng, Pigûlêyskaya û Tixonov, hema ew bû, wekî civaka Lêñgradê rakire piya û ew biryar ji meydanê da hildanê

Wira ji hev hat ber organêd jor nerasta ya vê biryarê bîne ber çava. Vira hate xanê xeysetê wiyi rast û hişk, karibûna nîta pêşya xwe bigihîne sêri.

2. 1956-57 s. ew sêkrêtarê teşkîla partyayêye. Salê xwegirtin û pêşvacûna para me. Idi 30 sal derbaz bûye. Josef Abgaroviç Orbeli para me pêşva dibe, Qanatê Kurdo alî wî dike. Hema vira merifeta wîye naskirin û qimet-kirina meriva hate xanê, dema bijartina kadra. Para wan sazkirî niha ji bi destanîn mezin kar dike û ew ji emekê Qanatê Kurdoye.

3. dawyê sala 1959—a dema bi xemuxurya Orbeli û Qanatê Kurdo pirsa sazkirina koma kurdnasyê tê daninê. Cara pêşin li sistêma akadêmyayêda koma kudrnasyêye meksûs dihate sazkirinê, ya ku gerekê mijûlî lêgerîna ziman, dîrok, netewenasi û edebyeta gelê kurd bibya.

Hevalno, ez ji piştovanê gotna Evgêni Ivanoviçim, Qanatê Kurdo zanyaryêda jîneke bextewar derbaz kir. Em gişkê ji bimrin, lê navê meriv wê her tim bîfî, eger bîranfna dehqâ wîda tim geşbe li ruh û bira şagirtê wida, ruh û bira şagirtê wîda û bi taybîfî li kitêbê wîda ewê ewi pey xwe hiştine. Qanatê Kurdo pey xwe kitêbê usa

Dumahîk rûpel 23



Qanatê Kurdo û malbatâ xwe

# FERHENGOKA BERBANGE

FERHENGOKA KURDIYA  
JÊRÎN Û JORÎN

A

Awat : Hêvi  
Awa yî : Derbederî

B

Bilaw kirdin : Weşandin  
Berhem : Efrandin, eser  
Bê endaze : Bê sînor, bê tixûb  
Bayexdan : Pîtepê kirin, îhtîmam  
Bîzûtnewe : Tevgîr, hereket  
Bê pena û pêç : Raste rast

D

Delê : Dibêjê  
Dilniyam : Piştrastim  
Dewlete zilekan : Dewletên mezin

E

Encam : Netice  
Emek : Wefa

Ê

Êsta : Niha

F

Firmesk Hesir, rondik  
Ferheng : Çand, çamûs

G

Gewahî : Şehade  
Gîrûgîrif : Geliş, problem  
Gift û go : Munaqşe  
Gerdan : Felek

H

Hengaw : Pêngav

Î

Îmro : Îro

L

Lêkolînewe : Lêkolîn, lêgerîn  
Le heman kat da : Eynî wext de

M

Melbend : Merkez  
Malawayî : Xatîr xwestin  
Mandû : Westayî  
Mêjû : Dîrok

N

Nawçe : dever  
Nêwan : Navber  
Nardin : Şandin  
Namîlke : Broşur  
Nîrx : Biha

O

Omêd : Hêvi

P

Peresendin : Pêşketin  
Pelemar : Erîş  
Pêşekî : Destpêk

Q

Qatabxane : Xwendingeh

R

Rade : Pile, derece  
Regezperist : Nîjadperest  
Rewişt : Edet  
Resen : Esîl

S

Sede : Sedsalî  
Sade : Efendi  
Serçawe : Serkanî  
Sebaret : Bi Nîspet

Ş

Şwêñ : Cî  
Şîkirdinewe : Tahîl  
Şêwandin : Xirabkirin  
Şêwe : İslûb, devok

T

Twana : Karîn  
Têperbûn : Derbasbûn  
Twejer : Leger  
Tenha : Bi tenê

W

Wutar : Nivîsar  
Wuşe : Peyv  
Welam : Bersiv

X

Xerik : Mijûl  
Xêl û hoz : Eşîret

Y

Yad : Bîranîn, bîrhatîn  
Ya xud : Yan ku

Z

Zorbe : Piranî  
Zimanewan : Zimanzan

## SERXWEŞIYA MALBATA Wİ

hîstîne, yê ku wê hertim kîr bêñ. Û heta zanyaryê cîhanyêye derheqa kurda heye, bîramnâ derheqa Qanatê Kurdo da wê bijî û heta hingê ew bi xwe namre.

Bi xatrê te Qanatê Kurdo.

### Şîna Qanatê Kurdo

Kiçanov Evgêni Ivanoviç, doktorê zanyarya dîrokê, serokê para Leningradêye İnstîtûta Rojhilatnasyêye Akadêmya Zanyaryêye Yekîti Sovêt.

Hevalno, dost û hevkarê berêz, Nâdîjda Vasilëvna, Wezir, qewm û pismamê Qanatê Kurdoye delal!

Iro em xatrê xwe Qanatê yê rojhilatnasyê dixazin, ne tenê rispîye para Leningradê, lê usa ji rispyê İnstîtûta Rojhilatnasyê bi giştî.

Qanatê Kurdo ji wê silsileta rojhilatnasa bû, ewê dawya salê 20-i dest pêka salê 30-i hatne nav zanyaryê (ulm). Wê silsiletê, ya nava cenga Niştimanyêye mezinra derbaz bû. Tevbûyê Cenga Niştimanyêye mezin Qanatê Kurdo pey altindaryêra vegerya İnstîtûta Rojhilatnasyê, Zanîngeha (Unîvîrsitât) Leningradê wê demê, gava piştî cenga cihanyêye duemîn li

welatê Rojhilata Nêzik bizava netew-yê-azadaryê teqleke nûye, hê zor standi bû û nava wê bizavêda şerkarya gelê kurde bo azayê, bi êginayî pêşva diçû. Qanatê Kurdo ji wan meriva bû, bi hûner û merifeta kijana li welatê me nasya zanyaryê hate sazkin. Ewî li Unîvîrsitât Leningradê dest bi hinkirina ziman, edebyet û çanda kurdî kir. Karekî usa pêvîst, yê ku bandûra xwe ya mezin hişt ser pêşvaçûna kurdnasyê li Moskvayê, Erêvanê û wan merkezê zanyaryêye mayîn, li ku lêgerina çanda kurdî dikan.

Qanatê Kurdo bi xwe pir tişt kir, wekî vira, li para Leningradêye İnstîtûta Rojhilatnasyê cara pêşin li welatê me kurdnasyê bê sazkin, ocaxake zanyaryê, li ku mijûli lêgerîna ziman, dîrok û edebyata gelê kurd dibin. Ewî bi xwe pir tişt kir, wekî bona wê koma kurdnasyê kadir bêne amadekirin. Ewî karekî pir mezin kir, bona kurde sovête û kurdê ji welatê derva varî li Leningradê, li kabinêta kurdnasyê hînbin, bivne zanyarê kurdnas, wekî paşê wegerne welatê xwe xizmeta gelê xwe bikin, tevî bîza va gelê kurde azadaryê bivin.

Qanatê Kurdo jiyanekê bextewar derbaz kir, ji ber ku ewî bi dil û can gelê xwe hiz dikir, temama jiyanâ xweda xizmeta gelê xwe kir û hêjayî hizkirin û naskirina gelê xweyî herf bilind bû. Gelê kurd ew hiz dikir, ew çawa lawekî xweyî mezin nas dikir. Ew ku niha em li vir ewqas kurdê Yekîti Sovêt û kurdê ji welatê dereke divînin şedetyê wê yekêye raste, ku ew karê ewî xizmet lê dikir, ew pîrsê ewî dabûn pêşya xwe, ewî bi mîranî û dilpâkî gihadine sêri.

Oanatê Kurdo, çawa zanyar nav û dengê mezin qazanc kir. Em zanin ew hatî bû bijartin çawa endemê kara, yê Akadêmya kurdaye komara Iraqê, ew yek ji himdarê İnstîtûta Kurdî bû li Parisê, nîvisarê wî idî mîjya cîhana zanyaryêda hatibûn naskirin.

Iro gava em xatrê xwe ji zanyarê mezin, komûnistî rast, mervê dipaqîji, mîranî dixazin, gere em carekê ji bijin, wekî her tişt gere bê kirin, bona ew karê ku Qanatê Kurdo temamya jiyanâ xweda xizmeta wî kirye, karê ku ewî jiyanâ xwe gişk dayê, hertm berdewambe, her pêşva here.

Bi xatrê te Qanatê Kurdo.

### QANATÎ KURDÛ LE ÇEND

- 3- Le Barey Mêjûy Rojhelatnasi Rosewe Mosko 1959  
B. 24. L. 39-51
- 4- Hewâlî Ekadîmyay Zanîsti Ermenistanî Sovyet Mosko 1955. J 10. L. 89-98
- 5- Le Barey Mêjûy Rohelatnasi Rosewe, Mosko 1955, B2. L. 360-380
- 6- L. A. Orbelî û Kurdnasi, Gurîn û Lêdawanî Dr. Ewrehmanî Haci Marif Bexda 1975
- 7- Nûsrâwe dêrînekan û meseley mêjûy roşinbirî gelanî Rojhelat, Mosko 1970, L. 54-57
- 8- Q. Kurdo "Hendêk Bîr û Ray Hele le Barey Ziman û Mêjûy Kurde we" wergeran û pêşekî bo kurdî; Dr. Ewrehman Haci Marif Bexda 1973-1974
- 9- Al- Hikome Elwetaniye we Muşkulet Elşîmal, bi zimanî erebî Bexda 1965

- 10- A- Cerîdet Elmunazîl J. 11 1966, B- Oisset Elekrad Fî Şîmal Elhraq- Qahire 1967 Al Xemrawî Samî; C- Qeziye Elkurdîye, Mahmud El- Durre, Beyrut 1966
- 11- A- F. Kirzioğlu Her Bakımdan Turk olan . B- Şerif M. Firat, Doğu İlleri ve Varto Tarihi Ankara 1961
- 12- "Kurtey em kitêbe nek hemûy, çunke ew layananey ke şêwandînî mîjûy kurde weryanne gêrawe." Le layen mamostayan Qanî û Kerim Zende we wergêrawete ser zimanî kurdî û le salî 1969 da le çapxaney Kameran le Silêmanî çapkirawê. Belam mamoste Q. Kurdo sûdi le kitêbekey Yasemî be Rosî wergirtuwe ke le salî 1943 da le layen Kelpakove we le farisiye we wergêrawete ser zimanî Rosî. " Birawane perawezakanî Dr. Ewrehmanî Haci Marif
- 13- Xisbak Şakir, Elmesele Elkurdîye, Bexda 1959
- 14- Beşikçi İsmail, "Ragwêzanî Kurd be Zor" İstanbul 1977, be zimanî Turki
- 15- Arife Hesen, Kurdekan London 1966, bi zimanî ingilizi.

ADRESS/NAVNIŞAN:

RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SJUNDBYBERG/SWEDEN

KURDISTAN

AZIL DURUMU